# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar :1396   22-Tîrmeh-2026   www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/   rojnameyaronahi   @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com   Rojnameya Ronahî   +963 984 370 218


# ‘Hunerên destan ji bo min qadeke afrîneriyê ye

**Solîn Mihemed / Qamişlo**

**Hunera karê destan a jinan ne tenê berhemeke dîtbarî ye, ew behsa berxwedan, ked û bedewiya giyanê jinê dike. Yek ji jinên ku bi hêza afrîneriya xwe hebûn û pêşketina xwe isbat kiriye, Hemrîn Betal e, ew bi têl, karton û cawê çewalan berhemên destçêkirî diafrîne.**





Hunerên destan ên jinan ne tenê çêkirina tiştên bedew in, lê belê kûrahiya dîrok, çand û nasnameya civakê ne ku bi her hûrguliyekê re zindî dibin. Her nexş û xêza ku ji bin tiliyên jinan derdikeve, çîroka herî kûr a dilê wan, daxwazên wan ên veşartî û evîna wan a ji bo jiyanê di nava xwe de dihewîne. Hunera destan a jinan tenê ne berhemeke dîtbarî ye; ew helbesteke bêdeng e ku behsa berxwedan, ked û bedewiya giyanê jinê dike. Dema ku jinek bi nexşan xêz dike, ew tenê rengan li hev nayîne, ew hest, bîranîn û xeyalên xwe yên herî şêrîn di nava wan xetan de dihûne. Jin bi riya hunerên destan her wekî dîroknasekî bêdeng in; wan bi salan e êş, şahî û destanên gelê xwe ne bi pênûsê, lê bi rîs, kerg û derziyan li ser rûyê dîrokê neqş kirine.

Yek ji jinên ku bi hêza afrîneriyê xwe isbat kiriye û di hunera karên destan de di demeke kurt de xwe pêşxistiye, Hemrîn Betal e.

Hemrîn ku 30 salî ye, berî şeş mehan dest bi vê pirojeyê kir. Ji destpêkê ve armanca wê tenê çêkirina xemlên malê nebû, belkî xwest ku afirîneriya xwe bi şêweyekî cûda nîşan bide û îspat bike ku jêhatî dikare derfetên nû biafirîne.

Di nav berhemên wê de selikên xemilandinê, selikên mêvanperweriyê, stendên pêşwaziyê, çarçoveyên wêneyan, vazoyên biçûk, fenerên daleqandî û gelek xemlên dîwaran cih digirin. Hemû van berheman bi şêwazeke sade, xwezayî û estetîkî têne çêkirin û li gorî daxwaza mişteriyan jî dikarin bi reng, mezinahî û xemilandinên taybet werin amadekirin.

Ji bo Hemrîn, hunerên destan tenê jêhatiyeke demkî nînin, lê qadeke ye ku tê de afirîneriya xwe derdixe holê. Ew materyalên hêsan û bi hêsanî peyda dibin wek têl, karton û qumaşê çewalan bikar tîne û wan vediguherîne berhemên ku hem bedew in hem jî bikêrhatî.

Hemrîn dibêje ku ji destpêkê ve hezkirina wê ya ji vê hunerê re bû sedema sereke ya berdewamiyê. Tevî ku ezmûna wê hîn nû ye, di demeke kurt de gelek teknîkên hunerên destan fêr bûye û niha dikare berhemên cûrbicûr biafirîne.

Di axaftina xwe de wiha dibêje: Her perçeyek ku ez çêdikim beşek ji dem, sebir û bala min hildigire. Ez hez dikim ku mirov bedewiya di tiştên hêsan de bibîne.”

Li gorî wê, her berhem demek taybet dixwaze. Hin berhem bi saetan xebat, hûrgulî û xemilandinê bi destan hewce ne da ku bi awayekî ku tê xwestin amade bibin.

Hemrîn dibêje ku berhemên ku herî zêde têne xwestin selikên mêvanperweriyê, bi taybetî yên cejnan, çarçoveyên wêneyan û xemilandinên malê ne. Her wiha gelek mişterî li gorî xwesteka xwe daxwaza guherandina reng, mezinahî an jî xemilandinên taybet dikin.

Tevî ku pirojeya wê hîn di qonaxa destpêkê de ye, Hemrîn plan dike ku di pêşerojê de werşeyeke taybet veke. Armanca wê ew e ku ne tenê berhemên xwe pêşkêş bike, lê herwiha keç û jinan jî di vê hunerê de perwerde bike. Ew bawer e ku ger hunerên destan piştgirî bibînin, dikarin bibin çavkaniyek baş a debara jiyanê.

Ji bo pêşxistina pirojeya xwe, Hemrîn hewl dide bi rêya medyaya civakî raman û dîzaynên nû bişopîne, da ku berhemên xwe li gorî çêj û daxwazên nûjen pêş bixe û bigihîne hejmareke mezintir a kesan.

Bi îradeya xwe û hezkirina ji bo hunerê, Hemrîn Betal nîşan dide ku afirînerî dikare ji materyalên herî sade dest pê bike û bibin berhemên ku bala her kesî bikişînin.



Bi kamîreya Lîloz Hisên

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER ŞAŞÎTÎ Û ŞAŞFÊMKIRINÊ**

**Devê wî ji girarê şewitiye pif dike kevçik:**
- Cihê pirsgirêk lê çêbûyî ne li wir li çareseriyê digere.

**Devê xwe şepiland:**
- Tişteke şaş got; tişteke ne di cih de got; bêrêzî kir.

Hesabê mal û sûkê li hev **dernakeve:**
- Her tişt weke daxwaziya mirov nabe.

**Ji devê wî felitî:**
- Bê ku bihizire got; bê xwesteka xwe got; nedixwest wisa bêje, lê ji devê wî derket.

**Ji devê xwe revand:**
- Bi heman wateyê.

Keşê got melê, ezê di xaç û selîbê te nim.
- Ji bo kesê tiştan tevlîhev dike tê gotin.

**Kir ku zelal bike kir girêk:**
- Xwest çareser bike lê xirabtir kir.

**Li peresû xist:**
- Şaşîtî kir; yên li derdora xwe şkênandin; li gorî civatê gotineke ne di cih de got.

**Li şûna hespan ker nayên girêdan:**
- Divê mirov li cihê kes yan jî tiştên qenc yên neqenc bi cih neke.

**Mela jî di Quranê de şaş dibe:**
- Dema yek şaşîtiyekê dike û tê rexnekirin hingê tê gotin.

Meşk diriyaye, ew pembû dixe qûna kerê.
- Pirsgirêk li kû ye, ew li kû li çareseriyê digere; naxwaze pirsgirêkê bibîne; ne li cihê pirsgirêkê li çareseriyê digere.

**Min xwar avêt lê rast ket:**
- Başiya min kirî ne bi zanebûn bû.

**Mîro, borî:**
- Ez çi jî bêjim êdî fayde nake; ez çi jî bêjim êdî nikarim bidim bawerkirin.

(Dema yek bixwaze tiştke baş ji bo hevalê xwe bike, lê hevalê wî tersê wê fêm bike û yê din jî nikaribe isbat bike ku dixwest qenciyê bike hingê tê gotin)

**LI SER BIAQILBÛN, ZANEBÛN Û NASKIRINÊ**

**Avêt aqilê paşî:**
- Bi kûrayî şîrove kir.

**Axaftina wî hat ve:**
- Rast got; gotina wî rast derket.

Bila ti kes ser wî re nebêje/bila ti kes ser wî re çêneke:
- Ti kes weke wî nizane bêje; ti kes weke wî nikare çêke.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Şoreşa 19’ê Tîrmehê: 14 salên têkoşîn û berxwedanê (3)



Di 19’ê Tîrmeha 2012’an de çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê dest pê kir û li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bingeha qonaxeke nû. Di 14 salan de şoreş bi xweparastin, Rêveberiya Xweser, komîn û meclisan, ziman, çapemenî û berxwedana li dijî DAIŞ û dagirkeriyê pêş ket. Îro jî, di nav pêvajoya peyman û entegrasyonê de, parastina destkeftiyên şoreşê mijarên herê giring in.**R-4**

## Jina ciwan ku wêneyên şehîdan dike tabloya dîrokê

Jina ciwan Rosîm Silêman diyar kir ku di nav rûpelên dîrokê de, huner her gav bûye qêrîna herî bêdeng û kûr a mirovahiyê û wiha got: “Gava ku azarên welatê me hêsirên dayikan diherikînin, huner dibe mertalek li dijî jibîrkirinê.”**R-2**




# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar : 1396   22-Tîrmeh-2026   www.ronahi.net/ku/   Nirx: 500 L.S


# STATUYA ŞENGALÊ BI ÎRADEYA GEL TÊ PARASTIN

Hevserokê Meclisa Şengalê Azad Hesen diyar kir ku nîqaşên li ser statuya Şengalê, metirsiya berdewam a DAIŞ’ê, rola Tirkiyê û projeya rêya pêşketinê tên kirin. Armanca gelê Şengalê entegrasyoneke demokratîk e ku di çarçoveya destûr û yasayên Iraqê de maf, nasname, xwerêveberî û hêzên parastinê yên gelê Êzidî bên parastin.**R-5**




## Şêniyên Taxa Zihûr a Qamişlo bendewarên ziftkirina rêyên xwe ne



Şêniyên Taxa Zihûr a bajarê Qamişlo diyar kirin ku ji bo ziftkirina kolanên wan, gelek caran serlêdana şaredariyê kirin e, lê bersivdayîna şaredariyê tenê bi sozan sînordar maye. Şêniyan bang li şaredariyê kirin ku sozên xwe pêk bînin û rewşa xizmeguzariyê baştir bikin.**R-8**

## Li Kurdistanê çar nîşaneyên dîrokî û xwezayî

Kurdistan xwedî nîşaneyên dewlemend ên dîrokî û xwezayî ye ku kûrahî û cihêrengiya mezin a şaristaniya Kurdî nîşan didin, ew şahidê zindî yê dîrokeke dirêj û nasnameyeke çandî ya kevnar e.**R-9**




## Şerê Ukrayna û Rûsyayê; 2 milyon û nîv qurbanî

Ji destpêka şerê Rûsya û Ukraynayê heya 20’ê Tîrmehê hejmara qurbaniyan ber bi zêdebûnê ve çûye, li gorî amaran heya niha 2 milyon û nîv qurbaniyên Rûsî-Ukraynî çêbûne û hîna jî şer berdewam dike.**R-3**





**Şoreşa Rojava**
Farûk Sakik   R-4



**Azadiya sînorkirî azadiya ji destdayî ye**
Rênas Efrîn   R-7



**Şoreşa Rojava Naqede, Tenê Şêwaza Xwe Diguhere**
Gulîstan Xalid   R-10

# Jina ciwan ku wêneyên şehîdan dike tabloya dîrokê

Jina ciwan Rosîm Silêman diyar kir ku di nav rûpelên dîrokê de, huner her gav bûye qêrîna herî bêdeng û kûr a mirovahiyê û wiha got: “Gava ku azarên welatê me hêsirên dayikan diherikînin, huner dibe mertalek li dijî jibîrkirinê.”

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Dîrok, carna ne di pirtûkên stûr de, lê di kaxezên piçûk, çiryayî û kêmronahî de veşartî ye. Gava ku dem derbas dibe, metirsî heye ku rûyên lehengên me di nav pelên tarî yên demê de winda bibin. Lê Rosîm Silêman li dijî vê windabûnê xebateke bêdeng dimeşîne. Ev çîrok, ne çîroka keçeke ku bi firçe û rengan dileyîzê ye; ev çîroka keçeke ku kaxez bi kaxez, wêne bi wêne bîranînên şehîdan kom dike û wan vediguherîne tabloyên herheyî.


**Rosîm bi vî karî rûmeta welatê xwe diparêze**

### Parazvana bîranînan

Jina ciwan Rosîm Silêman mîna zanyarekî ku li şopên windabûyî yên şaristanîyê digere, ew li pey wêneyên şehîdan e. Her wêneyek ku ew bi dest dixe, ji bo wê emanetekî pîroz e; perçeyek ji can û nasnameya xakekî ye. Karê wê yê pîroz gava dighêje odeya wê dest pê dike. Rosîm wêneyên şehîdan bi rûmet, bi rêz û bi nexşekî taybet li kêleka hev datîne, wan dike yek û wekî tabloyeke mezin a rûmetê li dîwêr xêz dike. Ew her wêneyekî piçûk dike dilê tabloyeke ku her rûyek tê de diçirise. Dema mirov li van tabloyên ku wê çêkirine dinêre, ne tenê wêneyan, lê yekîtî, fedakariya giştî û çîroka serhildana gelekî dibîne.

Rosîm bi komkirin û tablokirina wêneyên şehîdan, dibe pira herî xurt a ku nehêle bîranînên wan herin nav axê. Ew her wêneyekî ji jiyana asayî derdixe û tîne asta berhemeke dîrokî. Ew dihêle ku dayikek gava tê, rûyê kur an keça xwe di nava wê tabloyê de bibîne û bizanibe ku zarokê wê ne bi tenê ye, lê li cem hevalên xwe yên nemir e. Ev berhem, şahidiya hewldana keçeke dilsoz e ku tiliyên wê tenê wêne kom nekirin, belkî rûmeta herî pîroz a welatekî parastiye.

### Kurtejiyana Rosîm Silêman

Jina ciwan Rosîm Silêman di sala 2003’an de li bajarê Hesekê jidayîk bûye û ew heya 11 saliya xwe li bajarê Hesekê qedandiye, piştî ku Şoreşa Rojava dest pê kir ew bi malbata xwe re berê xwe dan Ferensa û li wir jiyana xwe berdewam kirin. Ew di nav malbatekî de mezin bûye ku hertim parastina çand û keltûra kurdî dikirin, lewma Rosîm jî ev yek ji zarokatiyê ve mîna nenikekî di hişê wê de hatibû çandin ku erkê her kurdekî ye xwedî li mîrasên xwe derkevin. Lewma hezkirina hunerê ji zarokatiyê ve li cem wê çêbû û pêre mezin bû, niha jî ew faşoyn dizayîn û girafîk dîzayîn dixwîne. Ev saleke ku wê dest bi hunerekî kiriye ku wêneyên dîrokî, sembol, çand, mîrasa kurdî kom dike li kêlek wê jî wêneyên şehîdan jî kom dike û wan dike tablo. Ji ber ku ew dûrî welatê xwe ye hertim hezkirinek û dilsoziyek ji bo axa welat li cem wê heye, lewma xwest bi vî cûreyê hunerê him parastina mîrasa kurdî bike him jî hezkirin û nêzîkatiya xwe li hember welat derxe pêş.



Di derbarî kom kirina wêneyên dîrokî, sembol, çand, mîrasa kurdî de jina ciwan Rosîm Silêman ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Bi riya karê xwe êşa gelê xwe dighînim’

Rosîm Silêman anî ziman ku her bostek ji axa welat hunerekî xêz dike û wiha got: “Armanca min ji vê hunerê ew bû ku ez bikaribim peyamekî bi şêwazekî cûda û modêrin bighînim derdorê bi taybet ciwanên kurd, da ku bikaribin fêrî dîrok, çand û mîrasa kurdî bibin û bi riya van tabloyan re êşa welatê xwe û dengê wan bighînim herkesî. Niha jî parçek herî mezin ji karê min ez li ser wêneyên şehîdan kar dikim û dixwazim di demên pêş de bêtir ji bo wan tiştan çêbikim. Ji ber ku her şehîdek xwedî bandorekî ye li ser min çi di milê lehengî, şehadet û wêneyên wan debê. Hertim em dibêjin ku 15 hezar şehîdên me hene lê em tucarî li wêneyên wan nanerin û navên wan nas naskin, lewma bi riya vî karê ku ez dikim ez hewil didim wan û çîrokên wan nas bikim û ji herkesî re parve bikim da ku ew jî wan nas bikin.”

### Hêviya herî mezin vegera li welate

Jina ciwan Rosîm Silêman axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got: “Malbata min hertim bi min re dibe alîkar ku ez vê hunerê berdewam bikim bi taybet dayîka min ji ber ku gelek caran dema ez winda dibim nizanibim li ser çi kar bikim dayîka min bi hizêr nû bi min re dibe alîkar. Di demên pêş de gelek piroje li pêşiya min hene lê ez destpêkê dixwazim fêrî çand û kiltûra xwe bibim û bi riya karê xwe ez wê mîrasa pîroz ji hemû cîhanê re parve bikim. Gelek kes ji min dipirsin gelo ez lênûsên xwe yên journaling difroşim yan na, heya niha min tiştek nefirotiye lê didemên pêş de dibe ku pirojeyek bi vî rengî çê bikim da ku mîrasa kurdî belav bibe. Hêviya min a herî mezin ew e ku ez di demek nêz de vegerim Rojavayê Kurdistanê û di nav gelê xwe de kar bikim û bi riya karê xwe re deng û êşa wan bighînim, heya ku em Kurdistanek azad bidest bixin û mafê gelê kurd were parastin.”

# ‘Lîstika Taekwondoyê ji bo jinê nîşaneya hêzê ye’

**Berçem Silêman/ Dêrik**

**Lîstikvan û rahênera Dibistana Pilingên Taekwondo ya Navdewletî ya navenda Dêrikê Lûceyîn Elî diyar kir ku lîstika taekwondoyê ji bo jinê nîşaneya hêz û sebirê ye.**

Taekwondo ne tenê hunereke şerî ye; ew lîstikeke olîmpîk e ku felsefeya xwebawerî, dîsîplîn û rêzgirtinê dihewîne. Jinên ku pîşeya vê werzişê dikin, astengiyên fizîkî û dabeşkirina zayendî yên klasîk derbas dikin, ji ber ku laşê jinê bihêz dike û şiyana xweparastinê dide her pirtûka temenî. Jin bi serkeftina di vê werzişa rûbirûbûnê de, dîtina civakê ya ku digot “werzişên şerî tenê ji bo mêran in” serûbin dikin. Jina têkwandokar di civakê de tenê wekî “werzişvan” namîne; ew dibe sembola guherînê û pêşengiya civakî dike.

Di derbar rola jina ku taekwondo dilîze di civakê de lîstikvan û rahênera Dibistana Pilingên Taekwondo ya Navdewletî ya navenda Dêrikê Lûceyîn Elî ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Şikandina qalibên civakê bi îradeya xwe’

Lûceyîn Elî anî ziman ku dema keçên ciwan dibînin ku jinek di taekwondoyê de serkeftî ye, baweriya wan bi hêza wan a hundirîn tê û wiha got: “Ez ji bajarê Dêrikê me û temenê min 18 sale, ez refa 12‘ê me, tevî xwendina min ez cihê xwe di navenda taekwondoyê de jî wek lîstikvan û rahêner digrim. Min ji sala 2014’an ve dest bi lîstika taekwondo kiriye. Dest pêkê birayê min navenda taekwondo li bajarê Dêrikê vekir û min cihê xwe têde girt, dema em bi cilên xwe yên taekwondo derdiketin jiderve cîranan gazinc dikirin û hertim di nav nakokiyan de bûn bi malbata min re. Bi çavekî cûda li me dinêrîn, lê me ev yek ji bo xwe kir hêzek ku em vî qalibê civakê bişkînin. Bavê min hertim li kêlek min bû û ew bû pêşeng ji bo ku ez riya xwe berdewam bikin û ji herkesî re isbat bikin ku tu ferq û cûdahî di navbera jin û mêran de nîne. Ji ber ku jinên ku hînî vê werzişê dibin, li dijî tundûtûjiya li ser jinê zanyariyê belav dikin û dibin xwediya xweparastina fizîkî.”

### Heya astekî hişmendiya civakê hatiye guhertin

Lûceyîn Elî axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: “Piştî çend sal derbas bûn êdî birayê min navend girt û rahêner Xelîl careke din sala 2017‘an de vekir û min dîsa ev lîstok têde berdewam kir. Niha ez him zarokan fêr dikim him jî ez dilîzim. Jin dema dibin rahêner, nifşên nû bi exlaq, rêzgirtin û dîsplîna taekwondoyê mezin dikin. Ev lîstok alîkariya tenduristiya derûnî ya jinan dike û fikar an zextên civakî kêm dike. Niha hinekî hişmendiya civakî hatiye guhertin qebûl kirin hinekî li cem wan çêbûye, ji ber ku ez berî çend salan û niha tînim bîra xwe gelek cûdahî heye. Di dema berî de lîstoka taekwondo ji bo jinê cihê şermê bû, lê îro roj gelek malbat bi destê xwe keçên xwe tomar dikin da ku cihê xwe di vê navendê de bigrin û hêza wan a parastinê zêde bikin.”

### ‘Pêwîste jin ji xwe bawer be’

Lîstikvan û rahênera Dibistana Pilingên Taekwondo ya Navdewletî ya navenda Dêrikê Lûceyîn Elî axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got: “Heya niha min cihê xwe di



zêdetirî 20 kûpayan de girtiye. Berî demekî me berê xwe da paytexta Şamê şagirtên me tevlî kûpayê bûn, ez wek rahêner çûbûm lê di demên pêş de dema kûpa ji bo kesên temenê wan ji 17’ê û jor de li dar bikeve ez ê cihê xwe têde bigirim. Di heman demê de em amadekariyan dikin da ku em tevlî kûpayên ji derveyî welat jî bibin, wek Urdin, Eman. Hêviya min ji hemû jinan re heye ku pêwîste ji xwe û îradeya xwe bawer bin, dema baweriya wê bi wê hebe wê bikaribe gelek serkeftina bidest bixe.”



# Ava çemê Nîl kêm dibe, pê re jî metirsî zêde dibin

Çemê Nîl duyemîn çemê dirêj yê cîhanê ye ku damarê gelek şaristaniyan bi hev girê dide, herwiha çavkaniya sereke ya avê li Sûdan, Esyobiya û Misrê ye. Lê îro kêmbûna wê dibe ku kirîzeke mezin bi xwe re bîne û bandorê li ser jiyana bi milyonan mirov bike.

**Navenda Nûçeyan**

Li Sûdanê kêmbûneke mezin û berbiçav di ava Çemê Nîlê de çêbûye, bi taybet li milê “Nîla Şîn” ku ji Çiyayên mezin ên Etiyopyayê, başûr-rojhilatê Sûdanê, tê. Pêla kêmbûna ji nişka ve ya ava Nîlê bandor li dirêjahiya wê ya ji Xertûmê heya wîlayeta bakur jî kiriye. Di heman demê de ev kêmbûn bû sedema derketina çend stasyonên avê ji xizmetê, di nava pirs û fikarên Misrî de li ser şîrovekirina rastiya ku çêbûye û girêdana wê bi xebitandin û temamkirina proseya depokirina “Bendava Ronesansê” ya Etiyopyayê.

Çemê Nilê duyemîn çemê herî dirêj ê cîhanê ye ku dirêjiya seranserê çemê 6.650 kîlometre ye. Çem ji başûr ber bi bakur ve diherike û du milên wî yê sereke bi navên Nîla Şîn û Nîla Spî heye. Nîl, çemê herî dirêj ê Parzemîna Afrîkayê ye ku di dîrokê de wekî çemê herî dirêj ê cîhanê hatiye binavkirin. Çemê Nîlê bi pîvana metrekup a ku salane diherike, di nav çemên herî mezin ên cîhanê de çema herî kême ku diherike. Nîl bi dirêjahiya 6.650 kîlometreyê di nav erdê 11 welatên wekî Tanzanya, Ûganda, Rwanda, Burundî, Komara Demokratîk a Kongo, Kenya, Etiyopya, Erîtrya, Sûdana Başûr, Komara Sûda û Misrêd derbas dibe.

Nîla Spî ji herêma golên Tropîkal li rojhilatê Afrîkayê diherike, ku baran li wir di seranserî sale de bi rêjeyên mezin dibare, ji ber vê yekê ew di demên hişkesaliyê de jî avê dide çem.

Nîla Şîn ji gola Tana li çiyayên Etiyopya diherike, rêjeyên pir mezin ji avê di demsalên barana havînê bi xwe tîne, ew çavkaniya herî sereke ya piraniya ava ku dighêje Misir û Sûdanê ye.

### Metirsî û tîbûn

Hejmarek ji vîdyoyên ku li ser medyaya civakî hatibûn belavkirin, fikarên li ser kêmbûna bêhempa û ne normal a asta ava Nîlê zêde kirine, di nav de pirsên li ser sedem, rola xebitandina “Bendava Ronesansa Etiyopyayê” û bandorên wê yên muhtemel ên pêşerojê li ser Sûdanê derketin holê.

Ji bandorên rastersat yên pêşîn a kêmbûna ava Nîlê kirîzeke giran a avê nîşan da, ku jiyana bi sed hezaran niştecihan li başûrê bajarê “Um Derman” û bakurê “Xertûma deryayî” li paytexta Sûdanê tehdîd dike, ji ber rawestandina“stasyona El-Saliha” başûrî Um Derman bi sedema kêmbûna tund a asta avê û dûrketina wê ji dergehên pompekirina wergirtinê.

Li wîlayeta Xertûmê, Desteya Avê bi fermî raghandin ku “stasyona El-Saliha“û“stasyona bakurê derya“ ji ber dûrketina rêya avê ji pompeyên wergirtinê, bi awayekî demkî ji xizmetê derketiye, ku ev yek jî bû sedem ku rayedar rêyên nû yên avê bikolin.

Li wîlayeta Çemê Nîlê, niştecihên herêma “El-Becrawiyê” kêmbûneke bebiçav a asta avê ji peravan heya 15 metreyan dîtine, lê belê li hin herêmên wîlayeta Bakur qadên berfireh yên qumê di nava çem de derketine ku mirov dikare bi lingan li ser derbas bibe.

### Sedema û faktorên vê kêmbûnê

Li gorî lêkolînên pisporên endezyariya bendavan û çavkaniyên avê, sedemên li pişt vê kêmbûnê li çend sedemên mirohavî û xwezayî vedgere, sedema serke ew e xwezaya bandora xebitandina “Bendava Ronesansê” ye, ji ber ku bendava Etiyopya şêwazê xwezayî û dîrokî yê herikîna “Nîla Şîn” guherandiye. Wekî din, kontrola yekalî ya li ser deriyên bendavê û mîqdara ava ku tê berdan, asta avê li welatên jêrzemînê dike rehînê biryarên xebitandinê yên ku bi Sûdan û Misirê re nehatine hevrêzkirin.

Pispor û lêkolînerên di warê avê kêmbûna asta avê ya li Çemê Nîlê, nemaze Nîla Şîn a, wekî xirabtirîn kêmbûna asta avê ya di dîrokê de dihesibînin û hema wextî bigihêje qonaxa ziwabûnê li seranserê deverên mezin ên welêt. Herwiha ew vê yekê wekî hişyariyek zû ji bo Sûdan û Misirê jî dibînin, ku bandora hilanîn û komkirina avê li bendava Ronesansê li ser van her du welatan piştrast dike, nemaze eger ev bi demsala baranê ya qels re hevdem be. Di heman demê de Etiyopya bêyî çavdêrîkirin an jî parvekirina daneyan li ser mezinahiya rezervên avê û rijandinan, bi tena serê xwe rêveberiya bendavê ji hêla teknîkî ve didomîne.

Lêkolîner ji bilî depoya gola “Bendava Ronesansa Etiyopyayê” balê dikişînin ser tevlîheviyek ji sedem û faktoran ku bûne sedema kêmbûna avê, bi taybetî derengmayîna demsala baranê li çiyayên Etiyopyayê ku piraniya herikîna xwe ya salane “Nîla Şîn” têr dike, ku bû sedema



derengketina hatina lehiya asayî ji bo mehên Hizêran û Tîrmehê, herwiha herikîna qels a çemên demsalî di destpêka payîza îsal de li gorî salên berê.

Pispor hişyar didin ku eger kêmbûna hawirdekirina avê û herikîna wê ji Çiyayên Bilind ên Etiyopyayê ber bi Nîla Şîn ve wekî niha berdewam bike, ev yek dê bibe sedema kêmkirina qadên çandiniyê yên avdayî hem li Sûdan û hem jî Misrê. Tê payîn ku ev mijar ji krîzeke avê ya taybetî ya Sûdanê wêdetir biçe û bandora wê ya demdirêj dê li rêveberiya rezervên avê yên Misrê jî bike.

### Kirîzeke tund di dabînkirina ava vexwarinê de

Daxuyaniyek ji hikûmeta wîlayeta Xertûmê eşkere kir ku piştî ku stasyona avê ya El-Saliha ji ber kêmbûna girîng a asta Nîla Şîn hat rawestandin, krîzeke giran a dabînkirina ava vexwarinê çêbûye, ku ev yek li hejmarek tax û gundên li başûrê herêma Um Dirmanê bûye sedema kêmbûna avê, di demekê de ku tedbîrên fermî yên lezgîn ji bo kontrolkirina krîza ku gefê li sed hezaran niştecihan dixwe, hatine girtin.

### Kirîza Bendava Ronesansê

Koka krîza Bendava Ronesansê ya Etiyopyayê ji sala 2011’an û vir ve di têkiliyên di navbera welatên Hewza Nîlê de kûr e, ji ber ku Addis Ababa bêyî hevahengiya pêşwext bi welatên jêrzemînê re bendavê li ser Nîla Şîn, çavkaniya sereke ya Çemê Nîlê, ava dike.

Misir, ku ji kêmbûna avê zehmetiyan dikişîne û ji sedî 97 ji pêdiviyên xwe bi Nîlê ve girêdayî ye, ji kêmbûna para xwe ya dîrokî û bandora wê li ser erdên çandiniyê ditirse, di heman demê de Sûdan di navbera tirsa hilweşîna bendavên xwe û xetereyên lehiyên ji nişka ve û sûdên muhtemed ên rêxistina herikîna avê de dudil e.

Ji deh salan zêdetir e, hemû danûstandin û navbeynkariyên navneteweyî ji ber israra Etiyopyayê ya li ser berdewamiya dagirtin û xebitandina yekalî bêyî îmzekirina peymanek qanûnî ya girêdayî ku van operasyonan birêve dibe, nemaze di demên hişkesaliyê de, têk çûne. Ev yek bendav ji projeyek pêşketinê kiriye navendeke germ a jeopolîtîk ku gefê li aramî, aştî û ewlehiya av û xwarinê ya nêzîkî 150 mîlyon welatiyên li Geliyê Nîlê dixwe.

### Maratona danûstandinan

Ji dema îmzekirina Danezana Prensîban di navbera serokên Misir, Sûdan û Etiyopyayê de di Adara 2015’an de li Xartûmê, danûstandinên Bendava Ronesansê di qonaxên aloz re derbas bûn, di wan de dosya di navbera geşbînî, serhişkî û bêçaretiyê de diçû, heriwha bi berdewamiya operasyonên dagirtina yekalî ya Etiyopyayê re hevdem bû, heya gihaştina vekirina fermî ya bendavê di Îlona 2025’an de û xebitandina wê ya yekalî.

Danezan 10 prensîbên bingehîn dihewîne, di nav wan de yên herî sereke pejirandina hevkariya ji bo pêşketinê di navbera hemû aliyan de, karanîna dadperwer, domdar û nezirardayîna berjewendiyên aliyên din, hevrêzî û hevkariyê di dagirtin û birêvebirina bendavê de. Her çend jî Misir û Sûdanê ev danezan wekî çarçoveyek pabendî ji bo Addis Ababa didîtin ku bêyî peymanek teknîkî û yasayî gavên yekalî neavêje, Etiyopyayê ew wekî belgeyek pejirand ku di hemû qonaxên avakirin û dagirtinê de rewatiya yasayî dide bendavê.

Rêça teknîkî ya komîteyên teknîkî jî di navbera salên 2016 û 2020’an de, herwiha navbeynkariya navneteweyî ya Dewletên Yekbûyî û Banka Cîhanî di salên 2019 û 2020’an de jî têk çûn.

Di Kanûna 2023’an de, Misirê ji ber xapandin û redkirina berdewam a Etiyopyayê ji çareseriyên yasayî û teknîkî yên navîn, pêvajoya danûstandinan bi tevahî rawestand, di heman demê de mafê xwe yê parastina ewlehiya av û neteweyî ya li gorî peymanên navneteweyî piştrast kir.

Di 9’ê Îlona 2025’an de, Etiyopyayê bi fermî vekirina “Bendava Ronesansê” pîroz kir û dest bi xebitandina wê ya bi tevahî kir.

Tevî ku Etiyopyayê ragihandiye ku kapasîteya herî zêde ya dîzayna bendavê 74 milyar metrekup e, lê belê çavkaniyan depoya heyî li ser 42 milyar metrekup li bilindahiya 625 metreyan ji asta deryayê texmîn kirine.

# Şoreşa Rojava: Rêya azadî û avakirina Sûriyeya Demokratîk

**Cemîl Xoce**

Şoreşa 19'ê Tîrmehê wekî qonaxeke dîrokî û gelekî girîng di dîroka Sûriyeyê û hemû pêkhateyên wê de tê dîtin. Ev şoreş ne bûyereke asayî bû, lê belê ew encama amadekariyên dirêj û têkoşîneke mezin bû.

### Paşxaneya Êşê û Destpêka Têkoşînê

Gelê Kurd bi salan li dijî siyasetên rejîma "Baas" a hilweşiyayî ku li dijî hebûn û çanda wan bû, têkoşiya. Kurd rastî zordariyeke mezin dihatin û bi sed hezaran mirov ji mafên xwe yên sivîl û welatvaniyê hatibûn bêparkirin. Polîtîkayên pişaftin û tunehesibandinê li ser wan dihatin meşandin. Di bin vê rewşa xirab de, gel dest bi rêxistinkirina refên xwe kir û şehîd dan ji bo serketina vê şoreşê. Hewldanên têkoşînê nesekinîn. Bi riya avakirina komîteyên gel û şaneyên veşartî yên ku bi salan bi dizî kar dikirin, dewam kirin. Dema ku krîza Sûriyeyê di sala 2011'an de dest pê kir, gelê Rojava xeta sêyemîn a serbixwe hilbijart; wan nexwest tevlî şerê mezhebî bibin û ne jî qebûl kirin ku di bin nîrê zordariya kevn de bimînin.

### Roja Rizgariyê û Destpêka Şoreşê

Di şeva 18'ê Tîrmehê ya sala 2012'an de, gelê Kobaniyê yê leheng rabû ser xwe û navendên jiyanê, saziyên ewlehî û îdarî yên rejîmê xistin bin kontrola xwe û rizgarkirina bajarê xwe bêyî rijandina xwîneke mezin ragihandin. Agirê şoreşê bi lez wekî agirê bi nava darên hişk bikeve ve belav bû, Dêrik, Efrîn û hemû bajar û gundên Rojava girt nava xwe.
Alên nû hatin daliqandin û gelê herêmê bi rêya sîstema komun û meclisên gel dest bi birêvebirina karên xwe bi xwe kirin. Ji bo cara ewil di dîroka xwe ya nûjen de, her kesî karî bi awayekî azad nasname û çanda xwe bîne ziman.

### Berxwedana Dîrokî Li Dijî Terorê

Piştî serketina şoreşê, herêm rastî gelek êrîşên hovane ji aliyê rejîma "Baas" a hilweşiyayî, hêzên girêdayî derve û Tirkiyeyê ve hat. Ya herî xeternak jî êrîşên berfireh bûn ku ji aliyê çeteyên "DAIŞ'ê" ve hatin kirin, bi taybetî di destpêkê de dema ku gelek dewlet di rûbirûbûna wan de bêhêz bûn.

Lê belê hêzên ku şoreşa 19'ê Tîrmehê li Rojavayê Kurdistanê temsîl kirin, di serî de Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), bi mertalî li dijî vê terorê sekinîn û nîşanî cîhanê dan ku ew dikarin li ber xwe bidin. Bajarê Kobaniyê piştî berxwedana lehengî ya ku Kurdan di sala 2014'an de raber kir, bû sembola berxwedana mirovî ya cîhanî li dijî terorê. Kurdên li her çar aliyên Kurdistanê, Ewropa û cîhanê, ligel dostên gelê Kurd ên enternasyonalîst û demokrat, li dora şoreşê bûn yek û tevlî bûn. Li Kobaniyê, keda pêşmerge û gerîlayan bi yên gelê herêmê re bû yek di rûbirûbûna terorê de û berxwedaneke dîrokî ya ku nayê jibîrkirin, nîşan dan. Hevpeymaniya navneteweyî piştî berxwedana lehengî ya Kobaniyê derbasî qada leşkerî bû. Şoreşa 19'ê Tîrmehê berfireh bû û gelê herêmên cihê yên Sûriyeyê tevlî bûn, ev yek bû sedema avakirina Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ku rûberên berfireh ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin.

### Şoreşa Jinê û Avakirina Civakê

Ji bo cara ewil di dîroka herêmê de, şoreşeke bi pêşengiya Kurdan karî bibe pêşengê hemû pêkhateyan û ev yek, yek ji destkeftiyên herî girîng ên şoreşê tê dîtin. Rojava bi hezaran şehîd û birîndar dan ji bo parastina herêmên xwe û destkeftiyên şoreşê.
Xwîna Kurdan bi ya pêkhateyên din ên sûriyeyê re tevlî hev bû ji bo parastina mirovahiyê û rûmetê li vê herêmê. Jinê roleke pêşeng û cîhanî di vê şoreşê de lîst. Jinê qeydên koletî û zordariya baviksalarî şikandin, meclisên xwe yên taybet, malên jinan û YPJ'ê ava kirin û bi rengekî wekhev di sîstema hevserokatiyê de cih girtin. Tevî şer û ambargoyê, avakirin, perwerde û pêşxistina saziyên civakî berdewam kir.

### Ber Bi Sûriyeya Nû Ve

Em îro di Sûriyeya nû de dijîn, piştî têkçûna rejîma kevn a ku nêzîkî 60 salî welat xistibû bin desthilata xwe de û ziyaneke mezin da gelê Sûriyeyê û herêmê. Sûriyeya nû encama têkoşîna hemû sûriyan e, di nav de gelê Kurd û pêkhateyên ku di nava Hêzên Sûriyeya Demokratîk û Rêveberiya Xweser de têkoşiyan.
Şoreşa Rojava da nîşandan ji cîhanê re ku vîna gel dikare jiyan û azadiyê biafirîne. Ev ruhê berxwedanê wê ji bo avakirina Sûriyeyeke demokratîk û piralî berdewam bike.

# Zagonên çawa guncav in?

**Reşo Mihemed**

Pirsgirêka Kurd di nava sînorê dewelta Tirk de yek ji pirsgirêkên herî dirêj û aloz ên Rojhilata Navîn e. Zêdetirî 50 sal in e ku ev pirsgirêk bi şer, pevçûnan, guhertinên siyasî û hewildanên ji bo çareseriyê re tê naskirin. Di van salan de gelek caran pêvajoyên aştiyê dest pê kirin, lê piraniya wan berî ku bi encam bibin bi rawestandin an jî bi têkçûnê qediyane, sedem jî weke her car dewleta Tirk û hişmendiya wê ya şerxwaziyê ye. Piştî evqas gavên ku ji destpêkirina pêvajoyê heya roja îro hatine avêtin û aliyê tekane ku ev pêvajo dimeşand Rêber Apo û Tevgera Azadiyê bû. Niha jî nîqaş li ser derxistina qanûneke çarçoveyê ji bo pêşxistina pêvajoya aştî û civaka demokratîk ketiye rojevê. Ev nîqaş mijara cuda û rola sereke, mafên siyasî û şertên hiqûqî yên pêvajoyê dixe navenda gotûbêja komîsyonê û tevahiya partiyên siyasî yên Tirkiyê û Bakur.
Tevgera Azadiyê ji bo vê qanûnê daxuyanî da û tê de da zanîn ku qanûna ku tê amadekirin divê ne tenê rê li ber çareseriya çekan veke, lê şertên siyasî û hiqûqî yên pêdivî ji bo hemû aliyan peyda bike. Li gorî vê nêrînê, qanûnek ku tenê beşek ji pirsgirêkê bibîne û aktorên bingehîn li derveyî wê bihêle, nikare bibe bingeha çareseriyeke mayînde.
Yek ji xalên ku gelek hate bal kişandin, rewşa Rêber Apo ye. Rêveberiya Tevgerê dibêje ku ji bo ku muzakere bi awayekî rast û bi encam pêkwere, divê şertên hiqûqî û fizîkî yên ku rê didin wî di pêvajoyê de roleke çalak bilîze bêne afirandin. Eger qanûna çarçoveyê vî alî negire nav xwe, wê ev yek bibe astengiyek li pêşiya pêşketina diyalogê.
Her car dewleta Tirk, serok û rayedarên wê diaxivin û dibêjin çek û çek, pirsgirêk ne tenê bi danîna çekan tê çareserkirin. Divê şertên ku rê didin hemû kesên ku di pevçûnê de cih girtine di jiyana siyasî ya demokratîk de beşdar bibin bêne afirandin. Em dizanin bi hezaran Gerîlla li ser çiyayên azad hene, dema ku derfetên siyasî, azadiya gotinê, azadiya rêxistinbûnê û beşdarbûna demokratîk were berfirehkirin, zemîna şerê wê kêm bibe û rê li ber diyalogê vebe, di encamê de jî wê kadroyên PKK û Gerîlla bikevin nava xebatên siyasî.
Rêber Apo ev pêvajo di demekê de da destpêkirin, demeke hestyar, pêşbîniyên wî beriya 10 salan ji bo siberoja herêmê û cîhanê hebûn, nas dikir ku şerê sêyem dest pê bike wê şerê aborî û nuklerî be, lewma her tim di nirxandin û perspektîfên xwe de doza aştiyê kiriye. Vaye em dibînin ku şerê Îran-DYA'yê di cewhera xwe de girêdayî aborî û çekê atomî ye, herêma Rojhilata Navîn li ber agirê vî şerî çûye, di heman demê de bandora xwe li pêvajoyê kiriye. Her ku şer dest pê dike û giran dibe hikumeta Tirkiyê hinekî tevdigere, piştî daxuyaniya 20'ê Tîrmehê ya ku Tevgerê da û li ser zagonan baş hat rawestandin êdî derfet hat dayîn ku şandeya Îmraliyê piştî nêzî du mehan serdana Rêber Apo bike. Mijara sereke di hevdîtina şande û Rêber Apo de tekez li ser zagonên ku niha tên amadekirin e, herwiha hewldana guhertina van zagonan e, ji ber ku weke tê payîn ev zagon ne li ser daxwaza Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û gelê Kurd e.
Şert û mercên ku divê li Bakurê Kurdistanê di makezagonê de bên bicihkirin naskirina mafê gelê Kurd û danîn hîmê demokratîkbûnê di serî de azadiya ragihandinê, azadiya derbirînê, azadiya rêxistinbûnê.
Qanûna ku tê amadekirin divê bi awayekî zelal, berfireh û pêkan be, ango divê demildest bikeve warê pratîkî. Ger naveroka wê ne zelal be an jî şertên wê bêwate bimînin, dibe ku di pêkanînê de pirsgirêk derkevin holê. Lewma girîngiya amadekirina qanûnek ku hem li gorî destûr be hem jî bikare pêdiviyên pêvajoyê bersiv bide.
Ji aliyê siyasî ve jî lihevhatina partiyên cuda gelek girîng e. Pirsgirêkeke ku zêdetirî nîv sedsalekê berdewam kiriye nikare tenê bi biryara aliyekî were çareserkirin. Ji bo çareseriyeke mayînde pêdivî ye ku hikûmet, partiyên muxalefetê, civaka sivîl û hemû aliyên têkildar di nav diyalogeke berfireh de cih bigirin. Ev yek dikare hem baweriyê zêde bike hem jî şertên pêkanîna qanûnê hêsantir bike.
Her çend nêrînên siyasî li ser awayê çareseriyê cuda bin jî gelek kes li ser yek xalê li hev tên. Di serî de bidawîbûna tundûtûjî û vekirina rêyên siyasî ji bo hemû civakê di heman demê de gelê Kurd ê ku bi hezarê salan ji mafê xwe bêpar maye, mafê xwe di hemû waran de bi dest bixe. Hem jî Tevgera Apoyî di hundir û derveyî Tirkiyê bi serkêşiya Rêber Apo tevgera siyasî û dîplomatîk bide meşandin. Rêber Apo her tim rêya aştî, diyalog û lihevkirinê li şûna şer û tundiyê bijartiye. Ji ber vê yekê her gavê ku ji bo kêmkirina pevçûnan û pêşxistina diyalogê tê avêtin, divê bi baldarî, li gorî bingehên hiqûqî û bi piştgiriya civakê were birêvebirin.
Di dawiyê de em dizanin Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk tenê bi gotinan nayê biserxistin. Ji bo serkeftina wê pêdivî bi qanûnên zelal, mekanîzmayên pêkanînê, pêbaweriya navbera aliyan û piştgiriya civakî heye. Dewleta Tirk û hemû partiyên Tirkiyê jî berpirsyar e di warê gavavêtinê de. Eger hemû aliyên têkildar amade bin ku bi rêya diyalogê pirsgirêkan nîqaş bikin û li ser bingehên demokratîk lihevhatinê bigerin, dibe ku şertên çareseriyeke mayînde çêbibin.


Gulîstan Xalid

## Şoreşa Rojava Naqede, Tenê Şêwaza Xwe Diguhere

Gelek kes hewl didin pêvajoya ku bi navê "entegrasyona demokratîk" tê naskirin wekî dawîya Şoreşa Rojava şîrove bikin. Lê dîrok û rastiya civakan tiştek din dibêjin. Ji bo miletek ku bi hezaran şehîd, bi hezaran birîndar, bi salan têkoşîn û bi bedelên giran azadiya xwe ava kiriye, şoreş nikare bi belgeyek, bi peymanek an jî bi guhertina formekê bi dawî bibe. Şoreş, berî her tiştî, hişmendiya gelan e; û dema ku hişmendî dijî, şoreş jî dijî.
Şoreşa Rojava tenê hilweşandina sîstemekê nebû. Ew avakirina jiyaneke nû bû. Ew vejandina hêza gel bû. Ew baweriya ku gel dikare xwe bi xwe birêve bibe bû. Ji ber vê yekê, şoreş ne tenê li ser erdê, lê di hiş, dil û çandê de jî hate avakirin. Tiştê ku di hişmendiya gel de cih digire, bi hêsanî nayê rakirin.
Entegrasyona demokratîk, heke bi bingehên maf, wekhevî û rêveberiya demokratîk were meşandin, nikare şoreşê tune bike. Berevajî, ew dikare qonaxeke nû ya têkoşînê be. Ji ber ku di şoreşan de dema pêwîstiya şer çêdibe jî ne ji bo şer e; armanca wan avakirina civakeke azad, dadperwer û demokratîk e. Dema ku şert û merc diguherin, rêbazên têkoşînê jî diguherin; lê armanc nayê guhertin.
Dîrok nîşan dide ku gelek şoreş piştî qada şer ketine qada siyasetê, civakê û çandê. Ew ne têkçûn bûn, ew guhertina formê bûn. Çem dema ku rastî keviran tê, rawestiyê nake; rêyekî din vedike û berdewam dibe. Şoreş jî wisa ye. Carinan bi dengê çekan tê axaftin, carinan bi dengê siyasetê, zanistê, hunerê û civaka demokratîk.
Gelê Rojava di vê pêvajoyê de dîsa salvegera şoreşa 19'ê Tîrmehê bi heman coş, heman bawerî û heman kelecanê pîroz kir. Ev pîrozkirina hêza gel bû ku şert û mercên nû bi hişmendî dixwîne. Gelên ku bi xwîna xwe azadî nivîsandine, dizanin ku parastina destkeftiyan carinan ji destxistina wan jî dijwartir e.
Ji aliyê felsefî ve, şoreş ne bûyerek e ku rojeka dest pê bike û rojeka biqede. Şoreş pêvajoyeke domdar a guherandinê ye. Mirov û civak her dem diguherin; ji ber vê yekê şoreş jî wekî jiyanê her dem di hereketê de ye. Dema ku hereket disekine, jiyan jî disekine. Ji ber vê yekê, şoreşa rastîn ew e ku xwe li gorî şertên nû nûve dike bêyî ku ruh û armanca xwe winda bike.
Her şehîdek ku ji bo vê şoreşê canê xwe bexş kir, her dayikek ku keçlawê xwe spart axê, her zarokek ku bi hêviya azadiyê mezin bû, di hişmendiya vê gelî de bingehek ava kir. Ew bingeh nikare bi guhertina şertên siyasî were rakirin. Çimkî şoreş, berî ku di qada siyasetê de be, di bîr û wijdana gelan de ye.
Ji ber vê yekê, divê em vê pêvajoyê ne bi çavê tirsê, lê bi çavê berpirsiyarî û hêviyê bixwînin.
Berxwedan tenê li ber xendeqan nîne; berxwedan ew e ku destkeftî biparêzî, hişmendiya gel xurt bikî û her şertê nû ji bo azadî û demokrasiyê veguherînî.
Şoreşa Rojava her heye. Dibe ku rengê wê biguhere, dibe ku amûrên wê biguherin, dibe ku qada têkoşînê ji şer veguhere siyasetê û avakirina civakê. Lê heta ku hêviya azadiyê di dilê gel de dijî, heta ku xwestina wekhevî û jiyana bi rûmet heye, şoreş jî dijî.



# Şerê Ukrayna û Rûsyayê; 2 milyon û nîv qurbanî

**Ji destpêka şerê Rûsya û Ukraynayê heya 20'ê Tîrmehê hejmara qurbaniyan ber bi zêdebûnê ve çûye, li gorî amaran heya niha 2 milyon û nîv qurbaniyên Rûsî-Ukraynî çêbûne û hîna jî şer berdewam dike.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Şerê Rûsya-Ukraynayê di sala 2026'an de ketiye qonaxeke nû, ev qonax jî li gorî rewşa siyaseta cîhanê, geşedanên ku rûdidin, berjewendiyên her hêzeke navdewletî û planên wan ên siyasî, leşkerî û aborî hatiye guhertin. Rast e êrişên Rûsyayê li ser Ukraynayê kêm bûn, lê zêdebûna windahiyên mirovî û leşkerî hate diyarkirin, di heman demê de şiyana Ukraynayê ya pêkanîna êrîşên dûr û kûr di nav axa Rûsyayê de zêde bû. Rûsyayê hêdî hêdî hêza xwe ya leşkerî winda kir, di heman demê de şer veguherî şerekî dirêj ê bêhêzkirin û vî şêwazê şer lêçûnên zêde li ser her du aliyan ferz kir.

### Windahiyên Rûsya

Li gorî lêkolîna CSIS windahiyên giştî yên hêzên Rûsyayê ji destpêka şerê dualî heta Hezîrana 2026'an gihîştiye nêzîkî mîlyon û 400 hezar qurbanî di nav de kuştî, birîndar û winda ji 400 hezar heta 450 hezar kes hatine kuştin. Lêkolîn eşkere kir ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ev kuştî û birîndarên Rûsyayê di asta yekem de ne. Hejmara qurbaniyên Rûsan ji çar qatan zêdetir ji hejmara giştî ya qurbaniyên Amerîkî di hemû şerên xwe de ji sala 1945'an vir ve ye û ji neh qatan zêdetir ji tevahiya qurbaniyên Sovyet û Rûsyayê di hemû şerên xwe de ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn vir ve ye.
Tê texmînkirin ku Rûsyayê di sala 2026'an de ji 30 hezar qurbaniyan zêdetir her meh tomar kiriye, ev hejmar ji rêjeya wergirtina wê ya mehane ya bi qasî 27,000 leşkerên nû derbas dibe. Ev yek bargiraniya li ser artêşa Rûsyayê zêde dike û guhertina windahiyên wê dijwartir dike.
Hêzên Ukraynayê di navbera Sibata 2022'an û Hezîrana 2026'an de di navbera 525 hezar û 625 hezar qurbanî de dane, di nav de 125 hezar heta 150 hezar hatine kuştin û hejmara giştî ya qurbaniyan li her du aliyan digihîje zêdetirî du mîlyon kuştî, birîndar û kesên winda. Li gorî daneyên dawî rêjeya windahiyên di navbera Rûsya û Ukraynayê de di nîvê yekem ê 2026'an de, li hemberî her leşkerekî Ukraynî ku hatiye kuştin 8 leşkerên Rûsî hatine kuştin. Berovajî salên berê ku li hemberî kuştiyekî Ukraynî 2 kuştî yan 3 kuştiyên Rûsî hebûn, sedem jî ew bû ku Ukraynayê dronên dronên girêdayî hişê çêkirî bi kar tanîn.

### Qelsbûneke bêhempa di operasyonên bejayî yên Rûsyayê de çêbûye

Lêkolîna CSIS piştrast dike ku êrişa bejayî ya Rûsyayê di sala 2026'an de bi awayekî zelal hêza xwe winda kiriye û rêjeya pêşveçûna wê bûye yek ji yên herî qels di dîroka şerê nûjen de.
Li ser xeta Kostyantynivka pêşveçûna navînî ya Rûsyayê bi qasî 50 metre di rojê de bû, lê di rojê de ew gihîşt 70 metre ber bi Pokrovsk ve û nêzîkî 90 metre di rojê de li ser xeta Sloviansk. Lêkolîn van rêjeyan wekî yek ji pêşveçûnên leşkerî yên herî hêdî yên sedsala borî bi nav kir, wan bi Şerê Somme di Şerê Cîhanê yê Yekem de re berawird dike û bi şerê xwe yê bêhêzmayînê û windahiyên giran di berdêla destkeftiyên xakê yên sînorkirî de dihat nasîn.

Lêkolîna Navenda Lêkolînên Istratejîk a Navneteweyî eşkere kir ku Rûsyayê ji bo kêmkirina qurbaniyan li şûna êrişên mezin xwe dispêre tektîkên êrişên bi dizî yên komên piçûk, lê van rêbazan bêyî ku serkeftinên stratejîk bi dest bixin, bûne sedema windakirina leşkerên Rûsyayê yên domdar.

### Kêmbûna serweriya Rûsyayê

Yek ji encamên sereke yên lêkolîna CSIS ew e ku Rûsyayê ji Tebaxa 2024'an vir ve yekem windakirina axê tomar kir. Di Nîsan û Gulana 2026'an de, hêzên Rûsyayê ji ber êrîşên dijber ên Ukraynayê li ser çend eniyan, nêzîkî 400 kîlometreçargoşeyî ji ya ku bi dest xistibûn zêdetir winda kirin. Agahî nîşan didin ku Rûsya niha nêzîkî 118 hezar kîlometreçargoşeyî axa Ukraynayê kontrol dike ango ji sedî 20'ê rûbera Ukraynayê ye, herwiha nêzîkî 75 hezar kîlometreçargoşeyî yên ku ji destpêka şer ve xistiye bin serweriya xwe. Berevajî vê, di navbera Çile û nîvê Adara 2026'an de, Ukraynayê nêzîkî 400 kîlometreçargoşeyî li dora Oleksandrivka û Hulyapoliyê ji nû ve bi dest xist, berî ku operasyonên xwe li seranserê eniyê di Nîsan û Gulanê de berfireh bike.

### Şer ber bi hundirê Rûsyayê ve diçe

Lêkolîn piştrast dike ku di sala 2026'an de êrîşên Ukraynayê yên di nav axa Rûsyayê de bi awayekî bêhempa zêde bûn, Kyêv zêdetirî 20 hezar êrîş li dijî saziyên leşkerî, aborî û lojîstîkî pêkanî bi taybet li ser parzûngehên petrolê, îstasyonên komkirina sotemeniyê û depoyên komkirinê. Herwiha Kargehên çêkirina mûşek, dron û elektronîkê, hem jî xetên trênê, balafirgehên leşkerî, navendên fermandariyê, keştiyên şer û cihên şerê elektronîkî, radar û pergalên parastina hewayî pir û depoyên cebilxaneyê jî hatin hedefgirtin. Ukraynayê ji bilî hedefgirtina baregeha hewayî ya Ukrainka, ku ji Kîevê zêdetirî 6,000 kîlometreyan dûr e, êrîşên dûr-menzîl li dijî bajarên wekî Moskow û St. Petersburgê jî dest pê kir.
Lêkolîn nîşan dide ku van êrîşan kapasîteya rafîneriya petrolê ya Rûsyayê kêm kir, li hin deveran kêmbûna sotemeniyê çêkir, xetên dabînkirinê têk bir, û beşên mezin ên hêza deryayî ya Rûsyayê bêkar kirin, û her weha tesîsên pîşesazî û leşkerî têk birin, bêyî ku bi tevahî şiyanên leşkerî yên Rûsyayê têk bibin.

### Bûyerên Hizîrana 2026'an

Ukraynayê di Hizêranê de ragihand ku ji destpêka sala 2026'an vir ve zêdetirî 600 km2 rûbera xwe vegerandiye û di meha Gulanê de jî destkeftî bi dest xistine.
Ukraynayê êrîşên kûr li dijî kargeheke elektronîkên mûşekan li Voronezh Rûsyayê dest pê kirin, di heman demê de pênc rayedarên Rûsyayê di êrîşê de hatin kuştin ragihandin. Sekreterê Giştî yê NATO'yê diyar kir ku Rûsya her meh zêdetirî 30,000 windahiyên leşkerî dikişîne û van windahiyan wekî hejmareke gelek bi nav kir. Ukraynayê îhtîmala guhertina destpêşxeriya agirbestê li Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî anî ziman, ev yek jî eger civaka navneteweyî tevnegere. NY ragihand ku di Hezîranê de 265 sivîl hatin kuştin û 1,816 birîndar bûn, di vê mehê de jî rêjeya herî bilind a qurbaniyan tomar kir, ji destpêka şer ve hejmara herî bilind a qurbaniyên sivîl ên vê mehê ye. Reuters destnîşan kir ku bi ji Sibata 2022'an vir ve di şer de ji her du aliyan ve bi qasî du milyon qurbaniyên leşkerî (kuştî, birîndar û winda) çêbûne, di nav de 1.4 milyon qurbaniyên Rûsî jî hene.
Hêzên Rûsyayê di 1'ê Hizêranê de êrişeke berfireh a bi moşek û dronan bire ser herêmên Ukraynayê ku Kîev, Dnipro û Xarkîv jî di nav de bûn. Di encamê de 10 kes hatin kuştin û derdora 100 kesî jî birîndar bûne.
Di êrişên Rûsyayê yên di 4'ê Hizêranê de 3 kes hatine kuştin. Artêşa Ukraynayê diyar kir ku Rûsyayê 2 mûşek û 216 dronên dûr-menzîl avêtine û da zanîn ku ku wan 198 ji wan xistine xwarê.
Li gorî rayedaran, ji ber êrişên dron û topan li herêma Zaporizhzhia ya rojhilatê Ukraynayê jinek, li Khersonê ya li başûr mêrekî 75 salî, her wiha jineke din jî li herêma Dnipropetrovsk hatine kuştin.
Di 12'ê Hizêranê de parve kirin diyar kir ku di êrişa şeva borî ya dronên Ukraynayê ya li ser herêma Temryukê de kesek hat kuştin û 3 kesên din birîndar bûn.
Di 15'ê Hizêranê de jî di êrişa Ukraynayê ya li ser bajarê Tula yê Rûsyayê de 3 kes hatin kuştin.
Di êrişa Rûsyayê ya li ser bajarên Kiev û Charkiv de jî 5 kes hatin kuştin û bi kêmanî 18 kes birîndar bûn.
Herwiha ji 19'ê Hezîranê heya 20'ê Hezîranê 187 dronên Ukraynayê li ser herêmên Rûsyayê rûxandin û 30 leşkerên Ukraynayê hatin kuştin
Di êrişên bi dronên Ukraynayê yên li ser Qirimê û herêma Krasnodar a Rûsyayê de herî kêm 5 kes di 21'ê Hizêranê de hatin kuştin.
Di êrişa Ukraynayê ya li ser tesîske pîşesaziyê ya herêma Voronezh a Rûsyayê de 5 kes di 22'ê Hizêranê de hatin kuştin, bi dehan birîndar bûn.
Di 25'ê Hizêranê de 660 balafirên bêmirov ên Ukraynayê ji aliyê sîstema wan a parastinê ve hatin îmhakirin. Di êrişên Ukraynayê de Moskov jî di nav de, gelek herêm hatin hedefkirin.
Wezareta Parastinê ya Rûsyayê ragihand ku pergala wê ya parastina hewayî ji 29 Hezîran heya 30'ê heman mehê balafirên bêmirov ên biçek ên Ukranyayê xistine xwarê.

### Bûyerên Tîrmehê

Rûsyayê êrîşên xwe yên dijwar li ser benderên Odessa û Mykolaiv berdewam kirin û di encamê de sivîl mirin û zirar gihişt keştiyên bazirganî û binesaziya benderan .Êrişên Ukraynayê yên li ser tesîsên enerjiyê yên Rûsyayê berdewam kirin, ku bû sedema kêmbûna sotemeniyê û zêdebûna lêçûnên hilberîna çandiniyê li hin herêmên Rûsyayê. Di êrişên Rûsya yên li ser Ukranyayê de 10 kes di 4'ê Tîrmehê de hatin kuştin.
Di 11'ê Tîrmehê de jî Li gorî rayedarên Ukraynayê, hêzên Rûsyayê bi mûşekekê êrişî Kîevê kir. Di encamê de bi kêmanî 10 kes birîndar bûn.
Rûsyayê ragihand ku di 12'ê Tîrmehê de di êrişa bi dronên Ukraynayê ya li ser Inerhodarê de 4 kes hatin kuştin û 4 kesên din jî birîndar bûne.
Di 14'ê Tîrmehê de jî hêzên Rûsyayê di şevê de 135 dron û 10 mûşekên cûrbicûr avêtin Kyêvê. Hêza Hewayî ya Ukraynayê ragihand ku pergalên wan ên parastina hewayî ji 8 mûşekên balîstîk ên ku ji aliyê Rûsyayê ve hatine avêtin, 5 ji wan xistine xwarê û ji 135 dronan 108 jî asteng kirine.
Di 13'ê Tîmehê de Hate ragihandin ku hêzên Rûsyayê bombeyek arasteyî bajarê Zaporizhzhia yê Ukraynayê kir. Di encamê de 3 kes hatin kuştin
Di 15'ê Tîrmehê de jî di şerê di navbera Rûsya û Ukraynayê de 13 kes hatin kuştin û bi dehan kes birîndar bûn.
Di 18'ê Tîrmehê de jî Rayedarên Rûsyayê ragihandin ku di encama êrişên dronên Ukraynayê de 7 karker hatin kuştin û bi dehan kesên din jî birîndar bûn, di heman demê de li Moskovê şewat li navendeke petrolê derket. Di şeva 18'ê Tîrmehê de jî Ji ber êrîşên hewayî yên Ûkraynayê li depoyên petrolê yên li herêma Stavropol a Rûsyayê, şewat derket. Heman şevê Rûsyayê jî bi 166 fuze û balafirên bêmirov êrîşî Ûkraynayê kir. Li Kîevê kesekî jiyana xwe ji dest da, 13 kes birîndar bûn.



Di 19'ê Tîrmehê de Rûsya 40 caran êrişî Uraynayê kir, hin kuştî û birîndar çêbûn. Di heman rojê de Ukraynayê êrişî bargehên petrola Rûsyayê kir, hem jî Rûsyayê 41 mûşek avêtin Ukraynayê û gundê Dinîbropîtrofisk xist bin serweriya xwe, piştre Ukraynayê 3 depoyên petrolê kirin hedef, da ku piştî wê Rûsya keştiyeke Ukrayînî bike armanc û 10 kesên tê de bikuje. Rûsyayê di heman rojê de mezintirîn êriş li ser Ukraynayê pêkanî, yek hat kuştin û 16 kes birîndar bûn.
Herwiha di 20'ê Tîrmehê jî Ukraynayê 7 keştiyên rûsî kir hedef, piştre Rûsyayê êrişî Ukraynayê kir 3 kes kuştin û 3 birîndar kirin, di heman rojê de Ukraynayê bi 400 dironan êrişî Rûsyayê kir û 10 birîndar kirin.

# Şoreşa 19'ê Tîrmehê: 14 salên têkoşîn û berxwedanê (3)

Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê dest pê kir û li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bingeha qonaxeke nû. Di 14 salan de şoreş bi xweparastin, Rêveberiya Xweser, komîn û meclisan, ziman, çapemenî û berxwedana li dijî DAIŞ û dagirkeriyê pêş ket. Îro jî, di nav pêvajoya peyman û entegrasyonê de, parastina destkeftiyên şoreşê mijarên herê girîng in .

**Amara Baran**



### Dagirkirin û koçberî

Dewletên dagirker li hemberî berfirehbûn û bandora sîstema xweser rasterast êrişî herêmê kirin. Dewleta Tirk a dagirker 20'ê Çileya 2018'an bi komên çeteyan êrişî Efrînê kir. Li dijî dagirkeriyê berxwedaneke dîrokî ya 58 rojan hat nîşandan. Lê mixabin Efrîn 18'ê Adara heman salê hat dagirkirin. Di 9'ê Cotmeha 2019'an de, di salvegera Komploya Navneteweyî ya dijî Rêber Apo pêk hatibû, dewleta Tirk a dagiker vê carê êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir, ew jî bi êrişên hovane dagir kirin. Êrîşên dewleta Tirk ji bo dagirkirina axa Bakûr û Rojhilatê Sûriyê heta roja me ya îro jî berdewamin dewleta Tirk piştê ku Efrîn û Serê Kaniyê dagirkirin ji vî sûd girtin û ketin nava hewildana êrîşên cur be cûr, ji bo ku tirsekî di nav gel de çêbikin, bi balafirên şer pêşengên civakê kirin armanç.

### Dî êrişên 2023-24'an de hewildanên têkbirina destkeftiyan

Dewleta Tirk a dagirker ku serkeftin û destkeftiyên şoreşê hezim nedikir, di sala 2023-2024'an de êrişeke pir dijwar li ser heremê û binesaziya heremê da meşandin. Dewleta Tirk a dagirker di 2023'an de nêzî 50'î caran êrîşî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, 2 nexweşxane, navendeke tenduristiyê ya şûştina gerçikan, kargeha oksîjênê, stasiyonên elekitrîkê û benzînxane hatin ruxandin. Di encama êrîşên hovane li ser sitasiyonên elktrîkê de, hijmareke pir zêde gel bêelektrîk man. Heman demê de gelek komkujî pêk anin. Ji bo ku îradeya gele heremê bişkînin pöşengê şoreşê kirin hedef, ji aliyê dewleta Tirk ve hatin şehidxistin.

### Desthilatdariya 61 salan hat rûxandin

Rêjîma Baas ku 61 sal li ser desthilardariyê bû, di 8'ê Kanuna 2024'an de bi plan û hewildanên hêzên derva hat rûxandin. Di şevekî de HTŞ'ê berê xwe da Şamê. Hatina Hikumeta demkî li ser dest hilatdarîyê, li Sûriyê alozî çêbûn. li heremên wek beravê û Siweyda qetlîam pêk anîn. Dewleta Tîrk ji hatina Hikumeta Demkî sud wergirt û li dijî destkeftiyên Şoreşê êrişên hovane pêk anî. Bi taybet li Minbic, Bendava Tişrîn û li Qaraqozaxê dest bi êrişan kirin. berxwedaniya gel planên wan têk birin, nehîştin ku Qarakozax û Bendava Tişrinê bên dagirkirin.

### Peymana 10' Adarê

Di 10'ê Adara 2025'an de peymanek di navbera Fermandarê Giştî yê QSD, Mazlûm Ebdî, û Serokê Hikûmeta Demkî ya Sûriyê, Ehmed El-Şera, hate îmzekirin. Ev peyman di şert û mercên ku Sûriye piştî guherînên mezin ên siyasî û leşkerî de derbas dibû de hate îmzekirin.

Armancên Sereke yên Peymanê; Vekirina deriyê diyalogê di navbera Şam û Rêveberiya Xweser de. Parastina yekîtiya axa Sûriyê, digel pejirandina maf û hebûna hemû pêkhateyên neteweyî û olî. Domandina şerê li dijî DAÎŞ û nehêlên ku komên tundrew ji valahiya siyasî sûd werbigirin. Avakirina komîteyên hevbeş ji bo nîqaşkirina yekgirtina saziyên sivîl û hin saziyên ewlehiyê. Çêkirina bingehek ji bo destûrek nû û pergala siyasî ya ku hemû pêkhate beşdar bibin.

### Peymana 1'ê Nîsanê li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê hate îmzekirin

Di 1'ê Nîsana 2025'an de QSD'ê û Rêveberiya hikumeta demkî li ser taxên Kurdan yên Helebê (Şêx Meqsûd û Eşrefiyê) peymanek ku ji 14 xalan pêk tê, hat îmze kirin û li gorî wê peymanê, hêzên QSD'ê û YPGê ji wan hardu taxan vekişiyan, tenê hêzên asayişê man. Fermandariya Giştî ya YPG'ê derbarê vekişîna hêzên xwe ji taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê de ragihandibû, hêzên Asayîşê bi berpirsiyariya herdû taxan bigitibana. Ev peyman li ser bingeha pêvajoya ku bi peymana 10'ê Adarê dest pê kiribû hate avakirin. Piştî îmzekirinê, dest bi cîbicîkirina hin xalan hate kir. Guhertina komek girtîyan, vekirina hin rêyan û xebata komîteyên hevbeş yek ji gavên destpêkê bûn ku di çarçoveya peymanê de hatin meşandin.

### Hêzên hikumeta demkî di 6'ê Çileyê de êrişî herdû taxên Helebê kirin

Civîna Parîsê ya ku di 5'ê Çileyê de pêk hat pêwîst e ku mirov bi baldarî binirxîne. Di vê civînê de hêzên herêmî û navnetewî beşdar bûn. Civîn li Fransayê pêk hat û wan hêzên navnetewî ronahiyek kesk da hikumetê ku êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin. Ev mijar bi taybetî di derbarê herêmên ku berê di destê rêjîmê de bûn de derket holê. Me piştî hilweşandina rêjîmê ew herêm girtin, lê paşê ji wan herêman xwe kişandin. Li dûv vê yekê kompleyek hat amadekirin û êriş pêk hatin. Ev êriş di 6'ê Çileyê de ji Helebê dest pê kir û li wir gelek komkujiyên nediyar hatin kirin. Ev civîn ne tenê li ser Helebê bû, lê belê civînek bû ku armanca wê êriş li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Armanca sereke ew bû ku îradeya gelên herêmê bişkîne, projeya demokrasiyê tesfiye bike û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Lewra piştî Helebê, êriş ber bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve fireh bû. Ji ber vê yekê, civîna Parîsê civînek li dijî projeya demokratîk ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Ji xwe beriya vê civînê bi rojekê ku di 4'ê mehê de rûniştina rêveberiyê bi hikumetê re çêbû wan gotibûn ku em ê li ser hin mijaran li hev bikin û herî kêm lihevkirinên heyî bicîh bînin. Lê di 5'ê mehê de wan dest bi êrişan kir.

### Peymana 29'ê Çileyê

Fermandarê QSD'ê Mazlûm Ebdê û Serokê hikumeta demkî Ehmed El-Şera piştê şereke dijwar li herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê, peymaneke agirbestê ku ji 14 de xalan pêk tê hat îmzekirin. Di xala yekemîn ya peymanê de hêzên xwe vekşişandina hêzên leşkerî cepheyên pêş. Hêzên ewlehiyê yên Wezareta Karên Hundirîn têkevin navendên bajarên Heseke û Qamişlo û entegrasyona hêzên ewlehiyê li herêmê werek destpêkirin. Dîsa 3 tugayên leşkerî yên QSD'ê werin avakirin û tugayek li Kobanê girêdayî Parêzgeha Helebê de, were avakirin. Entegrasyona saziyên Rêveberiya Xweser di nav saziyên dewleta Sûriyê de were pêkanîn, karmendên sivîl werin tayînkirin. Mafên sivîl û perwerdehiyê yên gelê Kurd werîn pêkanîn. Vegera koçberan bo deverên wan were mîsogerkirin. Armanca peymanê yekkirina axa Sûriyê, pêkanîna entegrasyonê li herêmê, xurtkirina hevkariya di navbera aliyên peywendîdar de û yekkirina hewildanên ji bo ji nû ve avakirina welat e.

### Hikûmeta Demkî siyaseta Baasê dide meşandin

Li Rojavayê Kurdistanê ku 14ê sal in zimanê Kurdî di dibistanan de bi awayekî fermî tê dayin, piştî Peymana 29ê Çileyê û xebatên entegrasyona demokratîk yek jî mijara herî zêde tê nîqaşkirin rewşa zimanê Kurdî ye. Hikûmeta demkî ya Sûriyeyê berevajî Peymana 29ê Çileyê perwerdehiya zimanê Kurdî qebûl nake û perwerdehiya zimanê Kurdî bi dersên hilbijartê ve sînorkirî dihêle. Ji aliyê Rojava ve jî ji bo qebûlkirina perwerdehiya zimanê Kurdî bi awayekî fermî çalakiyên gel didomin. Ji aliyê din vê jî di serî de mamoste, şagirtên di dibistanan de û hemû gelê ku li rojava dijîn, ji bo parastina destkêftiyên ziman li ser pêya ne. Herî dawî ji bo tabeleyên yek zimanî yên Erebî ku li saziyên fermî hatibûn daliqandin gel rabû ser pêya û nerazîbûn nîşan dide. hêjî hikumeta demki îradeya gel nasnekiriye di dixwazin navê dibistan û Bajaran bikin Erebî.

## Şoreşa Rojava



**Farûk Sakik**

Di destpêka şerê cihanê yê yekem de, di sala 1916'an li gor biryarên peymana Saykes-Picot dewletê Antant li ser parvekirina dewleta Osmanî li hev kirin.
Encamên vê siyasetê bûn sedemên di konferansa li San-Remo yê ya 19 û 26ê Nîsanê de, Kurdistan di navbera tirk, ingilîz û frensiyan de bê parve kirin.
Lê her tişt bi peymana Lozanê zelal bû. Di 24'ê Tîrmehê de dema ku peyman hat îmzekirin, xalên peymana San-Remo jî ketin meriyetê. Êdî Kurdistan 4 parçe bû.
Li Bakûrê Kurdistan dewleta Tirk ya nû hatî damezirandin, li Başûr Îngiliz û li Rojava jî Frensa hebûn.
Ji bo ku ev tixûbên di nav axa Kurdistan de hatibûn xêz kirin werin rakirin têkoşînek mezin hat dayin.
Rojavayê Kurdistan taybetmendiyek xwe yê taybet hebû.
Di gelek demên dîrokê de kesên ji ber zilma dewleta Tirkiyê baz didan, berê xwe dididan vê heremê. Rojavayê Kurdistan ji van rêxistin û kesayetên dihatin re malovanî dikir. Bi saya van mêvanan hesten welatperwerî jî belav di bû.
Di sala 2010an de li welatên Ereban pêla serhildanê li Tûnisê dest pê kir, gav bi gav herikî nava her bajar û welatî. Piştî demekê navê serhildanê bû bihara gelan. Ev bihar di sala 2011'an de derbasî Sûriyê bû.
Dema hat Sûrî êdî ji bo Kurdan jî dema tercûbeyên sala bû. Dema şoreşek hatibû. Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeha 2011'an ku mohra xwe li dîroka Rojhilata Navîn xistî.
Di şert û mercên şerê navxweyî yê li Sûriyeyê de kurd, ereb, asûrî û gelên din ji bo avakirina jiyaneke nû bi hev re dest bi têkoşînê kirin. Tevgera gel a ji Qamişlo rabû di demeke kin de li Kobanê, Efrîn û Cizîrê belav bû.
Lê piştî şoreşa Rojava hat destnîşankirin, dijminek vê şoreşê jî dijminatiya xwe îlan kir. Komara Tirkiyê.
Gelek êrişên dijwar çêbûn. Lê şoreşê xwe diparast û ji nû de birînê xwe dipêça. Ev hetanî destpêka sala 2026'an dewam kir. Dema ku di sala 2025an de HTŞ li Şamê bû desthilatdar, rojane heyet ji Enqerê derbasî vêderê dibûn. Ji her alî de dixwestin vê şoreşê tune bikin.
Di destpêkê de hin hêzên wek Amerîka destur nedidan van planên dewleta Tirkiyê.
Di destpêka sala 2026'an de herkesî li dijî şoreşa Rojava lihev kiribû. Li dijî Îranê wê şer destpêkira, Amerîka li ji berjewendiyên xwe Erdogan tercîh kir. Erdogan bi şertê ruxandina sîstema rêveberiya xweser qebûl kir. Li Parîs civînek de biryar girtin.
Ji Helebê destpêkirin û êrişên wan li serenserê Kurdistan belavbûn. Komkujiyên mezin pêkdanîn. Hemû destkeftiyên Şoreşê di hedefa wan de bû. Cîhan bêdeng bû. Bi tenê Kurdan li kolanan yekitiya xwe avakirin û Şoreşa Rojava parastin.
Lê mixabin bi êrişên dijminre ji navendek ve bi zanebûn êrişî vê Şoreşê kirin. Kampanyayên reşkirinê destpêkiribû. Ev kampanya heta roja me jî dewam dike. Heger bibêjin ku QSD dikaribû şer bike lê nekir, neheqiyek mezine. Artêşek ku ji Kurdan pêk tê nebû. Bi taybet kesên Ereb ku dinav artêşê de bûn, hiştin û çûn. Ev çûyina wan bu parçeyek kampanya reşkirinê. Şervanên Kurdan em jî berxwedana Kobanê nasdikin. Di vî şerî de dîsa bi lehengiya xwe pêşî li felekatên mezin girtin.
Raste hin kêmasî çêbûn. Dikaribûn hin biryarên girîng bigirtina. Nebû. Lê nayê wê wateyê ku ev kêmasî esas werin girtin. Hin deskeftiyên nû jî bi xwe re anî. Koçberên Efîn û Serêkaniyê vegeriyan ser axa xwe.Vegeriyan cîh û ware xwe. Parastina Şoreşa Rojava erka hemû Kurdan e.



# Li Kurdistanê çar nîşaneyên dîrokî û xwezayî

Kurdistan xwedî nîşaneyên dewlemend ên dîrokî û xwezayî ye ku kûrahî û cihêrengiya mezin a şaristaniya Kurdî nîşan didin, ew şahidê zindî yê dîrokeke dirêj û nasnameyeke çandî ya kevnar e.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**




Kurdistan yek ji xakên herî kevnar û xwedî şaristaniyeke kûr a Rojhilata Navîn e. Ji ber ku Kurd yek ji gelên resen ên Mezopotamyayê ne, di avakirina şaristaniya mirovahiyê de xwedî cihekî gelek girîng in. Tevî sînorên siyasî yên ku ev herêm bi dehsalan dabeş kirine, Kurd hîn jî van beşan wekî dirêjkirinek erdnîgarî û çandî ya yekane dibînin, ku bi dîrok, ziman û adetên wekhev ve girêdayî ye. Her herêm xwedî nîşaneyên dîrokî û xwezayî ye ku bûne sembolên nasnameya Kurdî û cihên geştyaran.

### Rojavayê Kurdistanê: Keleha Nebî Hûrî

Keleha Nebî Hûrî, ku bi dîrokî wekî Cyrrhus tê zanîn, li herêma Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê ye û yek ji cihên arkeolojîk ên herî berbiçav ên herêmê ye. Ew ji hêla generalê Seleucid Seleucus I Nicator ve di destpêka sedsala 3"an a berî zayînê de wekî bajarekî stratejîk li ser rêya bazirganî û leşkerî ya ku Antakyayê bi Mezopotamyayê ve girêdide hatiye damezrandin. Di serdema Romayiyan de, bajar bû navendeke girîng a îdarî û leşkerî, bi saya cihê xwe yê erdnîgarî geş bû. Şopên vê serdemê îro jî xuya dibin, di nav de bermahiyên şanoyek mezin a Romanî, kolanên bi stûn, pirên kevirî, dîwarên parastinê û goristanek şeşalî ku paşê di kevneşopiya herêmî de bi navê Nebî Hûrî ve girêdayî bû.
Di serdema Bîzansê de, bajar berî ku di sedsala 7"an a piştî zayînê de bikeve bin desthilatdariya Îslamî, ji bo xurtkirina parastinên xwe kelehek berfireh derbas kir. Bi demê re û bi guherîna rêyên bazirganiyê, girîngiya wê hêdî hêdî kêm bû heya ku ew bû cihekî arkeolojîk ku bermahiyên mîmarî yên ji şaristaniyên cûrbecûr diparêze. Îro, Nebî Hûrî wekî tomargeheke vekirî ya dîrokê tê dîtin, ku xirbeyên Helenîstîk, Romayî, Bîzansî û Îslamî li yek cîhekî kom dibin, ev yek wê dike yek ji girîngtirîn deverên arkeolojîk ên Rojavayê Kurdistanê û bala lêkolîner, dîroknas û kesên ku bi mîrateya çandî re eleqedar dibin dikişîne.

### Başûrê Kurdistanê: Keleha Hewlêrê şahidiya bi hezar salan dike

Keleha Hewlêrê yek ji navdartirîn deverên dîrokî yên Kurdistan û Iraqê bi giştî ye, ku li navenda bajarê Hewlêrê ye. Tê bawerkirin ku ev cih ji şeş hezar salan zêdetir e ku hatiye niştecîkirin, ev yek jî dike yek ji kevintirîn wargehên mirovan ên li cîhanê ku bi berdewamî lê dijîn. Keleh, ku li ser girêkî mezin ê dorhêlî yê ku li ser bajarê nûjen dinêre, bilind bûye û şahidiya gelek şaristanî û împaratoriyan kiriye, ji Asûrî û Farisan bigire heya Osmaniyan. Îro, keleh semboleke girîng a çandî û dîrokî ji bo gelê Kurdistanê temsîl dike û wekî Cihê Mîrateya Cîhanî ya UNESCO'yê hatiye destnîşankirin. Salane bi hezaran mêvan tên wir da ku di derbarê dîroka herêmê de fêr bibin û ji şiklê wê ya mîmarî ya bêhempa ku rasteqînî û nasnameya herêmî tevlihev dike kêfê bistînin.

### Bakurê Kurdistanê: Çiyayê Araratê, sembola xwezaya Kurdistan ê

Li Bakurê Kurdistanê, Çiyayê Araratê wekî yek ji nîşaneyên xwezayî yên herî navdar ên herêmê derdikeve pêş. Ew çiyayê herî bilind ê Tirkiyeyê ye, ji asta deryayê 5,000 metreyan bilindtir e û bi lûtkeya xwe ya bi berfê ve girêdayî piraniya salê tê naskirin. Çiya di hişmendiya Kurd de cihekî taybet digire, di gelek helbest, çîrok û berhemên hunerî de xuya dike ku dîroka gelê Kurd û menzera wan a çiyayî vedikolin. Her wiha bi saya dîmenên xwe yên bêhnfireh û dîmenên panoramîk ên bêhempa, ew hezkiriyên çiyageriyê ji çar aliyên cîhanê dikişîne.
Çiya bi gund û deverên çandiniyê ve hatiye dorpêçkirin ku şêwaza jiyana kevneşopî ya niştecihên herêmê nîşan didin, ku hin adet û kevneşopiyên Kurd di jiyana rojane de bi xurtî dimînin.

### Rojhilatê Kurdistanê: Hewraman, cewhera çiyayên Rojhilat

Ew herêmeke çiyayî ye ku di nav parêzgehên Kurdistan û Kirmaşanê de li Rojavayê Îranê û li Bakurê Rojhilatê Kurdistana Iraqê ye. Bajarên Merîwan û Paweh li aliyê Îranê li ser vê rêzeçiyayê ne û bajarê Helebçe û navçeya Xurmal li aliyê Iraqê ne. Piraniya niştecihên vê herêmê bi zaravayê Hewramî diaxivin, ku beşek ji zaravayê Goranî ye, ku bi xwe jî şaxek ji zimanê Kurdî ye. Herêm di heman demê de malovanê hejmarek şopînerên baweriya Yarsanî ye. Ew bi bedewiya xwezayî ya ecêb, ava zelal û jiyana çûkan a cihêreng û mî, dewar û bizinên pir navdar e. Ji hêla hunerî ve, xelkê Hewramanê xwedî şêwazek dengbêjiyê ya cihêreng in û stranên wan gelêrîn e, ji awazên hêdî, muzîkên ên ku ji bo afirandina atmosferek aram hatine çêkirin bigire heya stranên reqsê.
Herêma Hewramanê, ku li Rojhilatê Kurdistanê ye, yek ji cihên mîras û çandî yên herî berbiçav ên herêmê tê hesibandin. Ew bi xaniyên xwe yên kevirî yên ku li ser çiyayan bi şêwazek terasî hatine çêkirin navdar e, ku banê her xaniyek ji bo xaniyê li jorê wê hewşek çêdike. Hewraman bi bedewiya xwe ya xwezayî ya balkêş, ku çiyayên bilind, gelî û kaniyan bi hev re dike yek, tê nas kirin. Ew her wiha bi mîrateya xwe ya çandî ya dewlemend, muzîka gelêrî û cilên kevneşopî yên cihêreng tê zanîn. Hewraman mînakek zindî ya şiyana gelê Kurd e ku xwe biguncîne hawîrdorek çiyayî ya dijwar. Niştecihên wê şêwazek jiyanê û mîrateyek ku bi sedan salan ji nifşê xwe re derbas bûye parastine, ku ew dike yek ji cihên çandî û geştiyariyê yên herî girîng ên li Kurdistanê.
Hewraman bi çandiniya gwîz, mişmiş, xox û hinarê navdar e. Di nav sînorên Parêzgeha Helebçeyê de, ku li nêzîkî sînorê Iraq-Îranê li Bakur-Rojhilat e, zêdetirî 85,000 darên gwîzan û 12,000 donim baxçeyên fêkiyan hene.

### Yek mîrate tevî sînoran

Tevî şert û mercên siyasî û îdarî yên cuda li çar beşên Kurdistanê, ev nîşaneyên dîrokî û xwezayî yekîtiya mîrateya Kurdî û kûrahiya kokên wê yên çandî nîşan didin. Keleha Hewlêrê, Çiyayê Araratê, herêma Hewraman û Keleha Nebî Hûrî ne tenê cihên erdnîgarî ne, ew wekî şahidiyên zindî yên dîrokeke dirêj û çandeke dewlemend a ku ji hêla Kurdan ve bi nifşan ve hatiye parastin radiwestin. Ev cih ji bo Kurdan li hemû herêmên xwe çavkaniya serbilindiyê ne, pirên ku demên berê bi niha ve girêdidin ava dikin û bedewî û cihêrengiya çandî û xwezayî ya Kurdistanê bi cîhanê didin nasîn. Bi parastina van nîşaneyan, nifşên pêşerojê dikarin li ser dîrok û mîrateya xwe fêr bibin û girêdana xwe bi kok û nasnameya xwe ya çandî biparêzin.

# 'Çand û huner stûnên bingehîn ên avakirina civakê ne'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Rêveberê Rêveberiya Çandê li Parêzgeha Hesekê Ebdil Mecîd Xelef diyar kir ku erka sereke ya nivîskar, rewşenbîr û wêjevanên Kurd parastina çand û wêjeya Kurdî ye û wiha got: "Em hewl didin ku çanda Kurdî li tevahî Sûriyê bi pêş bixin û belav bikin."**



Her gelek xwedî çand û hunereke bi wê tê naskirin û ji civakên dîtir tên cûdakirin. Çand û hunera Kurdî jî yek ji çandên herî dewlemed û bedewe, salên dirêjin li ser çanda Kurdî siyaseta asmîlasyon û qirkirinê tê meşandin, lê tevî vê jî gelê Kurd karîbû ku çanda xwe biparêze û mayînde bihêle. Ji ber ku eger çanda gelekî hate tunekirin, hebûna wî gelî jî tune dibe.
Di vê derbabarê de Rêveberê Rêveberiya Çandê li parêzgeha Hesekê Ebdil Mecîd Xelef ji Rojnameya me re axivî.

### 'Çand û huner sitûna bingehîn ya avakirina civakê ye'

Ebdil Mecîd Xelef destnîşan kir ku hevgirtina civaka Kurdî sedema sereke a parastina wêje û çanda Kurdî ye û wiha got: "Çand û huner sitûna bingehîn a avakirina civakê ye, dîroka gelan bi rêya çand û hunerê zindî dimîne û tê parastin. Çand her tim zindî dimîne ji ber ku ji nifşekî derbasî nifşê din dibe. Dema ku bav û kalan stran, çîrok, destan û helbestên kevnar digotin, bi vî rengî çand û nasnameya xwe zindî dihiştin. Tevî hemû êriş û hewildanên qirkirinê Çand û hunera Kurdî dikarîbû zindî bimîne, herwiha Kurdan bi demê re çand û wêjeya xwe hîn zêde dewlemd kirin. Ji bo zindîkirin û dewlendkirina çand û wêjeya Kurdî gelek kar û xebat hate kirin û gelek berdêlên giran hatin dayîn û heya niha jî ev yek tê kirin. Hevgirtina civaka Kurdî sedemeke sereke a zindîmayîna çand û zimanê Kurdî ye. Em di gelek qonaxên zehmet yên siyasî, leşkerî û civakî re derbas bûn, lê me karîbû di van hemû qonaxan de çanda xwe ya Kurdî berdewam û belav bikin."

### 'Eger îrade û israra me xort be wê hemû zehmetî veguherin berhem'

Ebdil Mecîd Xelef da xuyakirin ku parastina çand û wêjeya Kurdî erka wêjevan, nivîskar û rewşenbîrane û wiha pê de çû: "Rewşa ku niha em di milê çandê de jiyan dikin ji ya berê ne cûda ye. Şerê cîhanê yê yekem û duyem bandoreke mezin li ser tevahî çand û civaka kir, lê ema ji niha û şûnde gelo nivîskar, rewşevbîr û hwd çiqas dikarin di dema me ya niha de van ezmûnan derbas bikin, civakê xwe hişyar bikin û çand xwe biparêzin ev girînge. Lê niha di hin civakan de qutbûnek di navbera nivîskar, rewşenbîr û di nava civakê bi xwe de jî çêdibe. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan û parastina çand û wêjeya Kurdî erka herî serek a wêjevan, nivîskar û rewşenbîr e, ku divê di vê qonaxê de pêşangiyê ji çanda xwe re bike û biparêz e. Belê li pêşiya parastin û mayîndekirina çandê de gelek zehmetî hene, lê em dikarin bi rêya semîner, çîrok û filiklorê çanda xwe biparêzin. Di her warî de wê zehmetî û astengî li pêşiya mirov derkevin, lê eger îrade û israra me xort be wê hemû zehmetî veguherin berhem. Pêwîste ji bo belavkirina çandê û mayîndekirina wê kesên pispor werin dîtin û perwerdekirin da ku çand û wêjeya civak xwe bi rengekî rast pêşkêş bike."

### 'Em hewaldidin ku çanda Kurdî li tevahî Sûriyê bipêş bixin û belav bikin'

Rêveberê rêveberiya Çandê li parêzgeha Hesekê Ebdil Mecîd Xelef di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ez weke rêveberê rêveberiya Çandê li parêzgeha Hesekê hatin erkdatkirin. Bi vê gave nû re em hewaldidin ku çanda xwe ya Kurdî li tevahî Sûriyê bipêş bixin û belav bikin. Herwiha çanda hemû pêkhateyan li herêmê biparêzin û bibin destek jin wan re. Di haman demê de em ê xwedî li Çanda Kurdî û çandên dîtir yên di hundir Sûriyê de derkevin."

# Şêniyên Taxa Zihûr a Qamişlo bendewarên ziftkirina rêyên xwe ne

Şêniyên Taxa Zihûr a bajarê Qamişlo diyar kirin ku ji bo ziftkirina kolanên wan, gelek caran wan serlêdana şaredariyê kirin e, lê bersivdayîna şaredariyê tenê bi sozan sînordar maye. Şêniyan bang li şaredariyê kirin ku sozên xwe pêk bînin û rewşa xizmeguzariyê baştir bikin.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bi salên dirêj e şêniyên Taxa Zihûr ya bajarê Qamişlo zehmetî û astengiyên mezin ji kolanên taxa wan ên axî dikşînin, nemaze di demsala zivistanê de ku derketina ji malê û çûyîna qedandina karên wan pir asteng û zehmet dibe bi taybetî ji bo zarokên wan dema ku diçin dibistanan. Di vê derbarê de şêniyan gelek caran serlêdan û giliyên xwe anîn ziman bi aliyên têkidar re û gelek soz ji wan re hat dayîn, lê şênî dipirsin ka heya niha çima ev soz pêk nayên. Hêjayî gotinê ku her sal şaredariya Qamişlo projeyên ziftkirinê pêk tîne û di her projeyekê de şêniyên taxê li bende ne ku taxa wan jî bê ziftkirin.

Di derbarê mijarê de şêniyên Taxa Zihûr ji Rojnameya re axivîn û xwestin bi rêya wê di rêya rdengê xwe bighghînin aliyên têkildar.

**'Em bi hêvî ne ku sozên şaredariyê bibin rastî'**

Welatiya bi nave Intîsar Xerbî ku ji Taxa Zihûr e diyar kir ku ew bi salên dirêj êşê ji vê pirsgirêkê dikşînin tevî ku wan gelek caran daxwazên dubare ji aliyên têkildarî pêkanîna projeyên ziftkirinê kirine û wiha got: "Her sal em daxwaza ziftkirina taxê dikin, gelek caran jî me serlêdana şaredariyê kiriye, her car jî soz didan me ku dê proje di demeke nêz de pêk bê. Di sala 2025'an de ji me re hat gotin ku wê projeya ziftkirinê berî sala 2026'an bi cih bînin, di heman demê de tîmên pispor jî serdana taxê kirin ji bo ku rastiya kolanên taxê nas bikin, di serdanana de piştrast kirin ku hewcdariyeke mezin a kolanên taxê ji bo ziftkirin heye, lê mehên dirêj li ser van sozan derbas bûn û me tu gavên rastîn li ser erdê nedît."

Intsar Xerbî destnîşan kir ku ew di demsala havînî de di nava toz û axê de dijîn û diyar kir kuev toz û axa ku dikeve malên wan de pir bandorê li ser tenduristiya wan dike û wiha anî ziman: "Em nikarin pencereyên xwe ji ber tozê vekin, di demsala çile de jî kolan tevahî dibin herî, ev yek dihêle ku çûn û hetin pir asteng bibe û êşa me ya roja girantir dike. Em tiştekî kêfê naxwazin, lê ji mafê me ye wekî welatî ku kolanên me jî wekî kolanên bajêr yên din zift bin, caranan em hîs dikin ku li dervî bajar dimînin an jî li çolbistanê ne, ne di hundirê bajarekî. Taxa me tevî meznahiya wê û berfirehbûna nifûsa wê paşguhkirî ye."

Intsar Xerbî wiha gotina xwe qedand: "Ev rastiya ku em jiyan dikin bandoreke neynî li ser jiyana şêniyan dike, bi taybet li ser xwendekaran û kesên bi temen mezin ku rojane êşê dikîşnin ji ber xirabûna rêyan. Divê şaredarî erkê xwe bi cih bîne, sozên wê bibe rastî û di demeke nêz de projeya ziftkirinê li kolanê taxê me pêk bîne."

**Zehemtiyên bi salan berdewam e**

Ji aliyên xwe ve welatiyê bi navê Îmad Hisko jî piştrast kir ku taxa wan ji salên dirêj ve êşê ji xirabûna rêya dikşîne, di çarçoveya nebûna projeyên ziftkirinê ku bi awayekî neynî bandorê li ser jiyan şêniyan û tevgera çûn û hatina di nava taxê de nîşan dide û wiha da zanîn: "Her sal sozan didin me, lê li ser erdê nehatine pêkanîn. Piştî salên dirêj ji bendewariyê, êdî nema baweriya şêniyan bi van sozan tê, her sale em dibhîzin ku dê projeya ziftkirinê ji bo taxa Zihûr wê bikeve miriyetê, lê sal û meh derbas dibn û em tu xebatên rastî nabînin. Kolanên me hîn axî ne û tijî çal in herwiha zehmetiyên ku em dikşînin her roj zêde dibin. Çalên ku li kolanan berbelav in zirarên mezin dighîne erebeyan û nahêle ku zarok li ber malên xwe jî bilîzin, ji bilî toza ku dikeve nava malan de di demsala havînî de û heriya zêde ku di demsala çile de çêdibe."



Îmad Hisko

Îmad Hisko wiha gotina xwe qedand: "Tiştê ku em aciz dibin ew e ku kolanên ku berê projeyên ziftkirinê lê hatine kirin dîsa zift dikin, lê heya niha kolanên Taxa Zihûr li devrî bi cih anînê ye, em gihaştin qûnaxekê ku tenê hêviyên em hema zifta ku ji kolanên din hatiye rakirin li kolanên me raxin, em bi vê jî razîne, tiştê ku em dixwazin ku proje pêk bê û salên paşguhkirin bi dawî bibe."

**Komîna taxê jî dosyayê dişopîne**

Ji aliyê xwe ve Hevserokê Komîna Şehîd Qendîl Kamîran Lewend destnîşan kir ku komînê dosyaya ziftkirina kolanên taxa Zihûr bi aliyên têkildar re şopandiye, lê hemû daxwazên wan ne hatine bi cih anîn û wiha got: "Komînê çend daxwazên fermî jî pêşkêş kirin e, herwiha serlêdanên dubare hatin ji bo xistina taxê di nava projeyên ziftkirinê, lê bersiv tenê di sozan de sînordar mane. Em gelek caran li şaredariyê jî vedgeriyan, her gavê jî tekez dikrin ku wê di demek nêz de bê pêkanîn û heta niha kolanên taxê wekî berê mane. Barana îsal ku barî giraniya pirsgirêkê erşkere kir, gelek malbatan zehmetî di çûn û hatinê de dîtin heta bi pêlavên çile jî nikarîbû li hember heriyê xwe bigrin, bi taybet rewş ji bo xwendekaran pir zehmet e."



Kamîran Lewend

Hevserokê Komîna Şehîd Qendîl Kamîran Lewend wiha gotina xwe qedand: "Ji ber domandina vê rastiyê malbatên taxê li her çareseriyekê digerin. Ziftkirina kolanan ji bo welatiyan mafên herî biçûk e, em bi hêvî ne ku sozên wan bibin xebateke rastîn û li ser erdê pêk were da ku zehemtiyên bi salan ku şêniyên taxê dibînin, bi dawî bibe."

# Tevgera keşteyên petrol û xazê li Tengava Hurmuzê kêm bûye

**Navenda Nûçeyan**

**Daneyên barkirinê yên ku rojane tên weşandin nîşan didin ku hejmara keşteyên di Tengava Hurmuzê re derbas dibin, pir kêm e, sedema wê jî şerê di navbera Amerîka û Îranê de ye.**

Daneyên ji Koma Borsaya Londonê nîşan dan ku çar keştî roja Yekşemê ji tengavê derbas bûn, li gorî heşt keşteyên roja berî wê. Daneyan eşkere kirin ku roja înê bi kêmanî sê tankerên madeyên petrolê û tankerek petrola xav derbasî Tengava Hurmuzê bû ji bo barkirina petrolê. Koma Borsaya Lundunê tevgera tarfîka keşteyên kontereyan, keşteyên kel û pelan, keşteyên veguhestina erebeyan, tankerên petrol, xaz û madeyên kîmyewî dişopîne.



Roja Yekşemê jî Neteweyên Yekbûyî yên Amerîkayê raghand ku ew roja heştan a êrişên li peyê hev li dijî Îran temam kiriye, di heman demê de hevalbendên Amerîkayê Kiwêyt û Behrên êrişên Îranê ku li dijî wan pêk hat raghandin.

Di çend rojên borî de, her du aliyan trafîka deryayî hedef girtine, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dorpêçkirina deryayî li ser benderên Îranê ragihand, di heman demê de Îranê ragihand ku ew keştîeyên ku qaîdeyên wê yên têkildarî navîgasyonê de li Tengava Hurmuzê binpê dikin, ku bi gelemperî pênc barkirinên petrolê yên cîhanê ji wir derbas dibin, hedef digire.

Desteya Operasyonên Bazirganiya Deryayî ya Birîtaniya roja Duşemê ragihand ku wan raporek wergirtiye tê hate destnîşan kirin ku li ser keşteyekê bi durahiya heşt mîlên deryayî li bakurê rojavayê Kemzarê li Omanê agir derketiye. Desteyê zêde kir ku sedema şewatê hîn jî di bin lêkolînê de ye.

Ji roja Pêncşemê ve tu tankerên xaza xwezayî ya şil ji tengavê derbas nebûne. Tanker û keşteyên din carinan pergalên şandinên xwe vedimirînin da ku derbasbûna xwe veşêrin.

Li gorî agahiyan hatiye nîşan dan ku di hefteya borî de tenê yek barhilgira xaza xwezayî ya şil ji Kendavê derketiye. Tevî vê yekê jî analîstên S&P Global di notekê de destnîşan kirin ku hilberîna xaza xwezayî ya şil û barkirina keşteyan li Qeter û Îmaratê, tevî astengiyên di şandina keştîyan de, bi lezeke xurt berdewam kir, ku bû sedema zêdebûna stokên xaza xwezayî ya şil li ser tankerên li Kendavê ne.

Di notê de wiha hat gotin: "Eger dorpêça Tengava Hurmuzê di hefteyên pêş de sivik bibe, ev keştî dikarin rê bidin zêdebûnek rêjeyî ya bilez a hinardekirinê û ev yek dê rê li ber hinardekirina xaza xwezayî ya şil ku berê hatiye hilberandin û barkirin, veke."



# Azad Hesen: Çareseriya Şengalê bi îradeya gel pêk tê

Hevserokê Meclisa Şengalê Azad Hesen diyar kir ku nîqaşên li ser statuya Şengalê, metirsiya berdewam a DAIŞ'ê, rola Tirkiyeyê û projeya rêya pêşketinê ye û wiha got: "Armanca me entegrasyoneke demokratîk e ku di çarçoveya destûr û yasayên Iraqê de maf, nasname, xwerêveberî û hêzên parastinê yên gelê Êzidî bên parastin."

**Tekoşîn Amara**

Di demên dawî de nîqaşên li ser statûya Şengalê, entegrasyona wê di nav sazî û dezgehên Iraqê de, rola hêzên parastinê û metirsiya berdewam a DAIŞ'ê careke din bûne rojev. Di wê çarçoveyê de Hevserokê Meclisa Şengalê Azad Hesen, bersiva pirsen Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:



**Di demên dawiyê de gelek nîqaş li ser ku Şengal dê bikeve bin kontrola hêzên ewlehiyê yên Iraqê, tên kirin. Ev rewş li ser paşeroja Şengalê û pergala ewlehiyê ya herêmê wê çi bandorê bike?**

Ev demek dirêje ku nîqaş li ser paşeroja Şengalê tên meşandin. Meclisa Gel a Şengalê bi hemû sazî, dezgeh û hêzên xwe yên parastinê dixwaze di çarçoveyeke yasayî û qanûnî de, bi hikumeta Iraqê re bigihîje rêkeftinekê. Piştî fermana 3'ê Tebaxa 2014'an, dema ku gelê Êzidî bi jenosîdekê re rûbirû ma, civaka Şengalê bi hêza xwe ya parastinê, sazî û dezgehên xwe ava kirin. Ev sazî di warê xizmetguzarî û ewlehiyê de roleke girîng lîstin û civak bi xwe, xwe rêve bir. Di Şengalê de tenê Êzidî jiyan nakin, gelek pêkhateyên din jî li wir dijîn. Ji ber vê yekê mijara ku îro tê nîqaşkirin, ne tenê pirsgirêka Şengalê ye, lê ji bo tevahiya Iraqê jî girîng e. Me heta niha nexwastiye ku derveyî qanûnên Iraqê tevbigerin û kar bikin. Em dixwazin hemû kar û xebatên me li gorî destûr û qanûnên Iraqê, bên meşandin.



Di heman demê de jî divê dewlet îradeya gelê Êzidî, maf û hiqûqa wê nas bike û pirsgirêkên ku bi salan wek girêkeke kûr lê hatiye, bi rêya diyalogê bên çareserkirin. Em naxwazin civaka Êzidî careke din bi ferman û qetlîaman re rûbirû bimîne.

Li herêmê û cîhanê şerê ku tê meşandin çi êrişên siyasî bin, çi yên leşkerî bin, guhertinên demografîk û pêvajoyên pir dijwar tên meşandin. Iraq jî parçeyek ji şerên ku li Rojhilata Navîn tê meşandin, para xwe digre. Ger em balê bikşînin hundirê Iraqê, Şengal jî parçeyek biçûk yên wê planê ye, li aliyekî de her kesek wek cihek stratejik lê mêyze dike, li aliyê din jî Êzidî pêkhateyek di aliyê bawerî û felsefeye de li seranserê Iraqê û cîhanê xwedan cudahiye. Lewma daxwaza me ew e ku bi rêya diyalog û nîqaşan pirsgirêk bêne çareserkirin, herwiha maf û hiqûqa gele Êzîdiyan bê naskirin. Pêwîst e gelê Êzidî wek pêkhateyek xwedî maf û biryar di pêvajoya çareseriyê de cihê xwe bigire.

**Piştî vekişîna Hêzên Koalîsyona Dijî DAIŞ'ê, hûn metirsiya valahiya ewlehiyê û xeteriya DAIŞ'ê li ser Şengalê çawa dinirxînin?**

Bê guman metirsiya DAIŞ'ê hîn jî berdewam e. Taybet li derdora Herêma Bîac (Baaj) heta îro jî tevgerên şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê dem bi dem tên dîtin. Di hundirê Iraqê de hîn jî kes û komên ku bi fikra DAIŞ'ê hatine perwerdekirin, hene. Ev kom gelek caran êriş li gelê Êzidî pêk anîne. Lê heta niha yasayeke taybet ku wan kesan wek sucdarên jenosîdê ceza bike, nehatiye derxistin, tenê wek kesên normal ku tişteke biçûk kirine, têne cezakirin. Ev jî sûceke mezine kesên ku alîkariya DAIŞ'ê kirine an jî di nav DAIŞ'ê de cihê xwe girtine, tenê werin desteserkirin. Divê ew bi derxistina qanûnek taybet, bên darizandin. Li gor agahiyan, çeteyên DAIŞ'ê hîn jî amadekariyên êrişan dikin. Li hin gundên Bîacê bi awayên cûrbecûr mal û milkên gel dikin hedef û diziya malan ji dikin. Mazota seyarê milet didizîn ji bo amadekariyên demê pêş. Ger ku Iraq ji aliyê ewlehiyê de tavîz bide, xeteriyeke mezin a DAIŞ'ê wê hebe. Wê DAIŞ bi qilifeke din êrişên xwe bidomîne.




**Li ser rola Tirkiyê di vê pêvajoyê de gelek nîqaş hene, hûn vê çawa dinirxînin?**

Herêm di nav pêvajoyeke gelek hestiyar de ye, şer û nîqaşên navbera Îran, Amerîka û Îsraîlê bi awayekî rasterast bandorê li Rojhilata Navîn dikin. Tirkiyê jî li gorî berjewendiyên xwe yên siyasî, leşkerî û aborî hewl dide cihê xwe di vê pêvajoyê de biparêze. Li gorî me, pêvajoya aştiyê ya ku bi bangê Rêber Apo dest pê kiriye, ji bo Tirkiyê û ji bo çareseriya pirsgirêkên herêmê, derfeteke girîng e. Ger pirsgirêkên navbera Dewleta Tirk û tevgera azadiyê bi rêya diyalogê neyên çareserkirin, ew ê xeteriyên nû ji bo herêmê biafirîne. Ji aliyê din ve, Tirkiyê di warê aborî û leşkerî de jî bi pirsgirêkan re rûbirû ye. Nîqaşên ku di civîna NATO'yê de hatin kirin jî, nîşan didin ku pêvajo pir hestyar e û dewleta Tirk ne di ferqê de ye, gelek plan li ser Tirkiyê hene.

**Projeya Rêya Pêşketinê û nîqaşên li ser ewlehiyê, li gorî we dikarin çi bandorê li statûya Şengalê, îradeya gelê Êzidî û hêzên parastinê bikin?**


Projeya rêya pêşketinê bê guman dê guhertin û veguhertinên mezin bîne. Rewşa siyasî ya herêmê bi hev ve girêdayî ye û çar parçeyên Kurdistanê jî ji van guhertinan bandorê dikin. Em bawer in ku ger çareseriyek li ser bingeha edalet û wekheviyê pêk were, wê ev yek li Iraq û Şengalê jî bandorên erênî pêk bîne. Ji bo nîqaşên li ser statûya Şengalê bi gelek aliyan re nîqaş û diyalog têne meşandin. Armanca me ew e ku Şengal di nav Iraqê de xwedî statûyeke qanûnî, îradeyeke xurt û rêveberiya xwe, bi xwe rêve bibe. Bi vê awayî hem sazî û dezgehên sivîl, Meclisa xwe hem jî hêzên xwe yên parastinê dikarin di çarçoveyeke qanûnî de xebatên xwe bidomînin.

**Di şert û mercên niha yên Iraqê de, entegrasyona demokratîk a Şengalê çawa dikare maf, nasname û xwerêveberiya Êzidiyan misoger bike?**

Em wek civaka Êzidî entegrasyoneke demokratîk dixwazin, ne entegrasyoneke ku bi zorê an takekesî pêk were. Iraqê di dîrokê de heta niha gelek caran civaka Êzîdî entegreye xwe kiriye, li bi şêwazeke takekesî. Lê daxwaza me ew e ku civaka Êzidî wek pêkhateyek xwedî maf, ziman, çand û îrade di nav Iraqê de were naskirin. Civaka Êzîdî jî wek her pêkhateyek li Iraqê xwedî parastina maf, ax û civaka xwe ye, ew jî mafeke bingehîn e. Herwiha, divê daîre û dezgehên li Şengalê û Iraqê ji aliyê kesên Êzidî yên profesyonel yên ku zanko xwendine ve, bên rêvebirin, ew ê ji bo Iraqê bibe ronahî. Iraq lazime ji aliyê kesên derveyî herêmê neyê revebirin. Em dixwazin di çarçoveya destûr û qanûnên Iraqê de bi dewletê re entegre bibin. Ev ne tenê ji bo civaka Êzidî, lê ji bo tevahiya Iraqê jî rêya çareseriyê ye. Baweriya me bi nifşên me heye. Wek civaka Êzidî baweriya me nemaye ku hindek hêz ji derve bên parastina Şengalê bikin. Tenê baweriya me bi hêza me û ciwanên me tê, ji ber ku yên di Fermanê de li hemberê DAIŞ'ê şer kirin û berdel dan, zarokên me bûn. Ew ciwan îro ji amadene ku ax û civaka xwe biparêzin.

# Civîna Bilind a NATO'yê û guhertinên jeopolîtîk li Rojhilata Navîn (2)

**Yûnis Bahram**



### Tirkiye û Îsraîl Ji hevkariya ewlehiyê heta reqabeta jeopolîtîk

Ji salên 1990'an vir ve, têkiliyên Tirkiye-Îsraîlê qonaxên cûda derbas kirine, ji hevkariya stratejîk bigire heta rageşiya siyasî. Di serdema piştî şerê sar de her du welatan hevkariyek nêzîk ava kirin herwiha parastin, hevkariya îstîxbaratê û pîşesaziyên leşkerî dihewan hem jî ji hevgirtina çend, berjewendiyên ewlehî û herêmî derdiket holê.
Lê belê ji sedsala 23.mîn vir ve, ev têkilî ji ber helwestên cûda li ser hejmarek pirsgirêkên herêmî, bi taybetî pirsa Filistînê, pêşketinên li Sûriyê û pêşbaziya ji bo bandorê li rojhilatê Deryaya Navîn, ketine qonaxek tevlihevtir.
Tevî demên nêzîkbûnê û hewldanên ji bo vegerandina têkiliyên dîplomatîk, nakokiyên siyasî û stratejîk faktorek girîng mane ku xwezaya têkiliya di navbera her du welatan de şekil dide.
Li ser mijara Sûriyê pêşîniyarên her du aliyan bi eşkere ji hev cuda ne. Îsraîl balê dikişîne ser pêşîgirtina li xurtkirina hebûna leşkerî ya Îranê û sînordarkirina veguhestina çekan ji bo komên çekdar ên ku bi Tehranê re hevalbend in, di heman demê de Tirkiye balê dikişîne ser ewlehiya sînorên xwe yên başûr, şerkirina rêxistinên ku ew wekî gef li ser ewlehiya xwe ya neteweyî dibîne û parastina bandora xwe li bakurê Sûriyê dike.
Tevî pêşanîyên wan ên cuda, Sûriyê qadeke temsîl dike ku hesabên ewlehîyê yên hem Enqere û hem jî Tel Aviv li hev dicivin û têkiliya wan dike tevlîheviyek ji pêşbaziya stratejîk û birêvebirina berjewendîyên hevpar, ne ji pevçûnek rasterast.

### Deryaya Navîn a Rojhilat dosya enerjî û jeopolîtîk

Di du dehsalên borî de Deryaya Navîn a Rojhilat bûye yek ji qadên herî berbiçav ên pêşbaziya jeopolîtîk, ji hêla keşfên gaza xwezayî, girîngiya boriyên enerjiyê û îdîayên serweriya deryayî yên hevbeş di navbera welatên ku sînorê herêmê ne de tê rêvebirin.
Nakokî di navbera Tirkiyê ji aliyekî ve û Yewnanistan û Qibrisê ji aliyê din ve, di derbarê destnîşankirina sînorên deryayî, herêmên aborî yên taybet û mafên bikaranîna çavkaniyên enerjiyê de, berbiçav in. Enqere îdia dike ku hin peymanên deryayî yên ku li herêmê hatine çêkirin mafên wê û mafên Tirkên Qibrisê li ber çavan nagirin, di heman demê de Yewnanistan û Qibris li gorî şîrovekirina wan a Peymana Neteweyên Yekbûyî ya li ser Qanûna Deryayê helwestên xwe diparêzin.
Ev ji çarçoveya xwe ya qanûnî û aborî derbas bûye, bûye beşek ji hevkêşeyên ewlehîya herêmî. Di salên dawî de, Yewnanistanê hevkariya xwe ya parastinê bi Dewletên Yekbûyî, Fransa û çend hevkarên din ên Ewropî re xurt kiriye, di heman demê de Tirkiyê di çarçoveya stratejiya xwe ya parastina berjewendiyên xwe yên deryayî û ewlehiya neteweyî de berdewam kiriye ku şiyanên xwe yên deryayî pêş bixe û hebûna xwe li Deryaya Rojhilat berfireh bike.
Di vê çarçoveyê de pirsgirêka Qibrisê yek ji dosyayên herî tevlihev di têkiliyên Tirkiye-Yewnanistanê de dimîne û di nav NATO'yê de dijwariyek domdar e, ji ber ku hem Tirkiyê û hem jî Yewnanistan endamên hevpeymaniyê ne û nakokiyên wan ên dualî yên berdewam berdewam dikin.

### Têkiliyên Tirkiyê-Rûsyayê Hevkariya pragmatîk û pêşbirka berdewam

Têkiliyên di navbera Tirkiye û Rûsyayê de wekî modelek têkiliyên ku hevkarî û pêşbaziyê bi hev re dikin xizmet dikin. Tevî helwestên cûda li ser hejmarek pirsgirêkên herêmî, her du welatan karîn kanalên ragihandinê yên bi bandor biparêzin û ji hêla têgihîştina wan a girîngiya berjewendiyên hevpar ve têne rêvekirin.
Ev hevgirtin di gelek waran de eşkere ye, bi taybetî Sûriyê, ku her welatek piştgiriyê dide vîzyonên cûda ji bo çareseriyek siyasî ya pêşerojê û Lîbyayê ku wan piştgirî dane aliyên dijber. Herêma Başûrê Qefqasyayê jî piştî pevçûnên dawî şahidiya dînamîkên ewlehî û siyasî yên tevlîhev kiriye.
Berevajî vê, hevkariya di sektorên enerjî, bazirganî û geştiyariyê de têkiliyên aborî yên di navbera her du welatan de xurt kiriye, û alîkariya kêmkirina bandora nakokiyên siyasî li ser têkiliyên giştî yên dualî kiriye.
Kirîna sîstema parastina hewayî ya S-400 a Rûsyayê ji aliyê Tirkiyeyê ve xalek girîng a werçerxê di têkiliyên wê yên bi Dewletên Yekbûyî û NATOyê re nîşan da. Di nav hevpeymaniyê de di derbarê lihevhatina teknîkî û siyasî de nerazîbûnên berfireh derxist holê, ku bû sedema cezayên Amerîkayê li dijî Enqerê û derxistina wê ji bernameya balafirên şer ên F-35. Di heman demê de, ev biryar xwesteka Tirkiyeyê ya berfirehkirina serxwebûna xwe ya stratejîk û cûrbecûrkirina çavkaniyên çekan li gorî vîzyona wê ya ji bo pêdiviyên ewlehiya neteweyî nîşan da.
Tevî nakokiyên berdewam ên di navbera Enqerê û Moskowê de, têkiliya wan bi piranî pragmatîk e. Her du alî jî hewl didin ku nakokiyên xwe bi rêya diyalog û hevrêziyê birêve bibin, di heman demê de hevkariya di warên ku xizmeta berjewendiyên wan ên hevpar dikin de biparêzin.
Ev dînamîk nîşan dide ku têkiliyên Tirkiye-Rûsyayê nikarin wekî hevpeymaniyek stratejîk di wateya kevneşopî de, ne jî wekî têkiliyek pevçûnek domdar werin binavkirin. Berevajî vê, ew nêzîkî modelek in ku hevkariya bijartî û pêşbaziya rêxistinkirî bi hev re dike - modelek ku xwezaya hawîrdora navneteweyî ya heyî nîşan dide, ku bi hevpeymaniyên şile û berjewendiyên têkildar ve tête diyar kirin.

### Pirsa Kurd di qonaxek dîrokî ya hesas de

Bi ronahiya veguherînên bilez ên li Rojhilata Navîn diqewimin, hêzên siyasî yên Kurd xwe bi qonaxek nû re rû bi rû dibînin ku analîzek baldar a rêziknameya herêmî û navneteweyî ya guherbar hewce dike. Ezmûna dîrokî nîşan daye ku helwestên hêzên mezin pir caran ji hêla berjewendiyên wan ên stratejîk ve têne destnîşankirin, û ku hevpeymanên navneteweyî ne statîk in, lê li gorî şert û mercên siyasî û ewlehiyê diguherin.
Di dehsalên borî de, Kurdan şahidiya veguherînên girîng di rewşa xwe ya siyasî de kirine, çi bi rêya ezmûna Başûrê Kurdistanê, Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, an jî pêşkeftinên siyasî û çandî yên di nav Tirkiye û Îranê de. Lê belê, ev destkeftî bi giranî girêdayî hawîrdora herêmî û navneteweyî mane, hawîrdorek ku bi guhertin û nezelaliya domdar ve têne diyarkirin.
Ji ber vê yekê, dijberiya bingehîn a ku hêzên Kurd pê re rû bi rû ne ne tenê di misogerkirina piştgirîya derveyî de ye, di heman demê de di şiyana wan a avakirina bingehên navxweyî yên domdar de ye, di nav de saziyên bi bandor, rewatiya civakî, rêveberiya baş û şiyana avakirina têkiliyên hevseng bi aktorên cûrbecûr re.

### Vebijarkên stratejîk ji bo Kurdan li Tirkiye, Sûriye û Iraqê

**-Xurtkirina Lihevhatina siyasî**
Dabeşbûna siyasî di navbera hêzên Kurdî de yek ji wan pirsgirêkên herî berbiçav temsîl dike ku bandorê li ser şiyana wan a mijûlbûna bi veguherînên herêmî re dike. Idyolojiyên cûda di navbera partî û tevgerên siyasî de, çi di nav dewletek yekane de be an jî di navbera herêmên cuda yên Kurdî de, carinan îhtîmala avakirina stratejiyek hevpar li ser mijarên sereke sînordar dike.
Xurtkirina lihevhatina siyasî nayê wateya jiholêrakirina pirrengî an cûdahiyên rewşenbîrî, lê belê pêşxistina mekanîzmayên ji bo diyalog û hevrêziyê ye ku dihêle nakokiyên di çarçoveyek demokratîk de werin rêvebirin û helwestên ku dikarin bandorê li hawîrdora herêmî û navneteweyî bikin, werin avakirin.

**-Avakirina saziyan û xurtkirina rêveberiyê**
Ezmûnên siyasî yên vê dawiyê nîşan didin ku berdewamiya her ceribandinek di rêveberiyê an rêveberiya xweser de bi giranî bi hêza saziyan ve girêdayî ye, ne tenê bi şert û mercên siyasî yên demkî re.
Ji ber vê yekê pêşxistina pergalên îdarî yên bi bandor, xurtkirina serdestiya hiqûqê, baştirkirina xizmetên giştî, piştgirîkirina pêşkeftina aborî û misogerkirina beşdariya pêkhateyên civakî yên cûrbecûr faktorên girîng in, ev yek jî ji bo xurtkirina aramî û rewatiyê.
Herwiha parastina mafên hemû pêkhateyên neteweyî, olî û civakî li deverên ku piraniya wan Kurd in, hêmanek girîng e di avakirina baweriya navxweyî û pêşîgirtina li cudahîyên civakî de ku bibin çavkaniyên pevçûnê.

### Piştgirîya Derveyî li ser Rewatiya Navxweyî Bispêrin

Ezmûnên herêmî nîşan dane ku piştgiriya navneteweyî dikare bibe faktorek beşdar, lê ew garantiyek mayînde pêknayîne. Siyasetên hêzên mezin li gorî berjewendiyên wan diguherin û dema ku şert û mercên stratejîk diguherin, dibe ku hevpeyman bên guhertin.
Ji ber vê yekê avakirina bingehek navxweyî ya bihêz li ser bingeha beşdariya siyasî, pêşkeftin û saziyan ji bo misogerkirina berdewamiya demdirêj û aramiyê, faktora herî girîng dimîne.

**-Pêşxistina gotûbêjek siyasî ya rastîn**
Pirsgirêka Kurd di warê awayê pêşkêşkirina xwe di hawîrdora herêmî û navneteweyî de bi dijwarîyekê re rû bi rû ye. Li şûna ku ew di çarçoveya pevçûna ewlehiyê an rûbirûbûna siyasî de were sînordarkirin, ew dikare di nav nerîneke berfirehtir de were pêşkêşkirin ku bi demokrasî, mafên welatîbûnê, aramiya herêmî û çareseriyên siyasî yên li ser bingeha diyalogê ve girêdayî ye.
Pêşxistina lihevkirineke siyasî ku bikaribe aliyên cûda çareser bike, di heman demê de tevliheviyên herêmê û berjewendiyên welatên cîran li ber çavan bigire, dibe ku şansên gihîştina têgihîştinên domdartir, zêde bike.

### Di Navbera berjewendiyên dewletê û îradeya gel de

Geşedanên dawî yên li Rojhilata Navîn nîşan didin ku herêm di nav guhertineke berfireh a hevsengiya hêz û hevpeymanan de ye. Tirkiye hewl dide ku pozîsyona xwe wekî hêzek herêmî ya bi bandor xurt bike, Îran dixebite ku tora xwe ya bandorê biparêze, û Îsraîl li ser pêşîniyên xwe yên ewlehiyê disekine, di heman demê de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di çarçoveya pêşbaziya navneteweyî ya berfirehtir de bicihbûn û pabendbûnên xwe li herêmê ji nû ve dinirxîne.
Di vê navberê de, Rûsya hewl dide ku hebûna xwe di gelek mijarên herêmî de biparêze, tevî zextên ku ji hêla şerê li Ukraynayê ve hatine ferzkirin, di heman demê de dewletên Kendavê ku dixwazin bandora xwe ya siyasî û aborî berfireh bikin, her ku diçe girîngtir dibin.
Di vê rewşa tevlihev de gelên herêmê bi du dijwarîyan re rû bi rû dimînin, nemaze parastina maf û berjewendiyên xwe di heman demê de dûrketina ji bûyîna alava di pevçûnên hêzên mezin de.
Dîroka siyasî ya Rojhilata Navîn nîşan dide ku piştgirtina tevahî ya piştgiriya derve dikare destkeftiyên demkurt peyda bike, lê ew bi serê xwe bingehek domdar ji bo aramiyê pêknayne.
Di derbarê pirsgirêka Kurd de, qonaxa din dê ji hêla hejmarek faktorên bi hev ve girêdayî ve bandor bibe, di serî de cewhera veguherînên li Sûriye û Iraqê, şeklê têkiliyên Tirkiye-Rojava, pêşeroja reqabeta Amerîka-Îranê û şiyana hêzên Kurdî ji bo pêşxistina sazî û gotûbêjên xwe yên siyasî.
Rojhilata Navîn dikeve qonaxek nû ku bi guhertinek bilez di hevsengiya hêzê de û nezelalbûna sînorên kevneşopî yên di navbera ewlehiya herêmî û navneteweyî de tê xuyangkirin. Di vê qonaxê de hêza leşkerî û piştgiriya derve êdî ji bo bidestxistina aramiya siyasî têrê nakin. Di şûna wê de avakirina saziyan, xurtkirina rewatiya civakî û rêvebirina cihêrengiyê dibe serdest.
Tirkiye ji ber cihê xwe yê erdnîgarî, endamtiya xwe ya NATOyê, û bandora xwe li ser pirsgirêkên Sûriye, Iraq û Deryaya Rojhilat di vê hevkêşeyê de lîstikvanek girîng dimîne. Pirsgirêka Kurd jî yek ji wan pirsgirêkan dimîne ku dê ji hêla guhertinên herêmî û navneteweyî ve bandor bibe, lê çareserkirina wê dê bi girîngî bi şiyana aktorên herêmî ve girêdayî be ku vîzyonek siyasî ya rastîn û domdar çêbikin.
Di cîhanekê de ku hevpeymanî bi lez diguherin, faktora herî bibandor di pêşeroja her pirsgirêkek siyasî de ne tenê asta piştgiriya derve ye, lê belê şiyana avakirina saziyên bihêz, parastina rewatiya navxweyî û pêşxistina stratejiyek demdirêj a ku dikare guhertinên berdewam çareser bike, dê were destnîşankirin.
Paşeroja Rojhilata Navîn ne tenê bi nakokiyên hêzên mezin ve girêdayî ye, lê di heman demê de bi şiyana gelên herêmê ve jî ji bo veguherandina guhertinên dîrokî bo derfetên avakirina pergalên aramtir, dadperwertir û hevsengtir ve girêdayî ye.




# Jiyana komînal... Ji komînaliya seretayî heta projeya Civaka Demokratîk... (1)

**Dijwar Ehmed Axa**

Ji dema ku mirov dest bi rêxistina jiyana xwe di nav komên biçûk de kir, hevkarî bû yekem rêya mayîna jiyanê. Mirov bi tena serê xwe nikarîbû li hember xwezayê bisekine, lê di nav civakê de hêzek dît, ew jî hêza pêydakirina ewlekarî, xwarin û aramiyê. Ji vir ve yekem şêweyên jiyana hevpar derketin holê; Jiyanek ku li ser parvekirina çavkaniyan û berpirsiyariyan, berî ku dewlet û desthilatdariya navendî bi têgihîştina îroyîn derkevin holê, hate avakirin. Di wê demê de mirov di nav komên klanan de dijiyan û di her komekê de bi giştî ji 30 heta 35 kesan pêk dihat. Ev kom yekîtiya bingehîn a rêxistina civakî bû ku jiyana rojane, parastin û hilberînê li ser bingeha hevkarî û alîkariyê bi rê ve dibirin. Lê di dirêjahiya dîrokê de, şêweyê rêxistina civakî gelek caran hatin guhertin. Împaratorî û dewletên cuda hatin û çûn, lê ramana civakek ku bikare karûbarên xwe bi xwe birêve bibe, her dem bi awayekî ji awayan ma. Di sedsalên 19 û 20'an de, ev raman bi hêzeke nû vegeriya û di bin navên cûr be cûr de hate naskirin, ya herî navdar jî komîn an jiyana komînal bû. Îro jî jiyana komînal tenê têgeheke dîrokî nîne. Ew bûye mijareke fikrî û siyasî ku gelek dibistanên ramanê li ser disekinin. Gelek kes wê ne li ser desthilatdariya navendî û minûpleya biryaran, lê ji bo avakirina civakekê li ser bingehê beşdariya gel, demokrasiya rasterast û parvekirina desthilatê dibînin. Ev têgeh taybetî bi ramanên Rêber Abdullah Ocalan berfirehtir bû ku wê di çarçoveya projeya Neteweya Demokratîk de ji nû ve şîrove kir û bi rexneyek kûr li ser dîroka dewletê, desthilatê û civakê, modela nû ya rêxistina civakî pêşkêş kir.

### Gavên yekem ên jiyana komînal

Gelek lêkolînerên zanista civaknasî û antropolojiyê bawer in ku civakên yekem ên mirovahiyê di şert û mercên ku bi navê "Komînaliya Seretayî" tê naskirin de, dijiyan. Di wê qonaxê de hîn milkê taybet pêş neketibû. Av, daristan, zevî, mêrg û hemû çavkaniyên xwezayî wekî milkê hevpar ê civakê dihatin hesibandin. Hilberîn jî li gorî pêdiviyên endamên civakê dihat parvekirin. Di wê demê de ne dewlet, ne rêxistinên îdarî û ne jî artêşên daîmî hebûn. Biryar di nav klanan de bi rêya şêwirê dihatin girtin ku li hin cihan mezinên klanê biryar didan û li hin cihên din jî hemû endamên civakê beşdar dibûn. Mayîna jiyanê jî zêdetir bi hevkarî ve girêdayî bû ku bi pêşbaziyê; Nêçîr, çandinî û parastina civakê hemû berpirsiyariyên hevpar bûn. Lê bi pêşketina amûrên hilberînê û derketina zêdebariya aborî, civak hêdî hêdî guherî. Cudahiyên civakî derketin holê, milkê taybet belav bû û bajarên yekem û dewletên navendî ava bûn. Ji wê gavê û şûn ve, desthilat hêdî hêdî ji destê civakê derket û ket



destê saziyên dewletê, bi vî awayî qonaxeke nû di dîroka mirovahiyê de dest pê kir.

### Ji civakê ber bi dewletê ve

Li gorî gelek ramanzan û lêkolîneran; Derketina dewletê ne tenê pêşveçûneke îdarî bû, lê guhertineke bingehîn di awayê têkiliyên civakî de jî çêkir. Bi zêdebûna dewlemendî û derketina çînên civakî, desthilat hêdî hêdî di nav destê komeke biçûk de kom bû. Di encamê de saziyên hikumetê, artêş, dadwerî û pergala bacan her ku diçû berfirehtir bûn û desthilata wan li ser civakê zêde bûn. Ev pêşveçûn bû sedema ku gelek şêweyên rêveberiya civakî ya herêmî ku li ser beşdariya rasterast a gel hatibûn avakirin, hêdî hêdî paşve biçin. Li şûna wan pergala birokratîk a navendî pêş ket û karûbarên gel ji navendê ve hate birêvebirin. Lê belê kevneşopiya rêveberiya civakî bi tevahî winda nebû. Li gelek gundên Asya, Afrîka û Ewropayê, civakên herêmî berdewam kirin ku av, zevî, mêrg û çavkaniyên hevpar, bi rêya hevkarî û rêkeftinên civakî bi rê ve dibirin. Herwiha di serdema navîn de li Ewropayê, hin bajar bi navê şaredariyên azad (Free Municipalities) derketin holê. Ev şaredarî xwedî astek ji serbixwebûnê bûn, ji desthilata feodal dûr mabûn û bi rêya meclisên herêmî karûbarên xwe birê ve dibirin.

### Jidayikbûna ramana nû ya komînê

Bi destpêka Şoreşa Pîşesaziyê li Ewropayê di sedsalên 18 û 19'an de, civak bi guhertinên mezin ên aborî û civakî re rû bi rû ma. Ev guhertin bûn sedema ku cudahiya navbera xwediyên sermayeyê û karkeran zêdetir bibe. Di encamê de gelek ramanzan dest bi lêgerîna modelên nû ji bo rêxistina civakê kirin. Sosyalîstên utopyayî, wekî Robert Owen û Charles Fourier bang li avakirina civakên hevkar kirin, civakên ku li ser bingehê parvekirina kar, hilberîn û çavkaniyan were avakirin. Di heman demê de hin ramanzan bawer bûn ku demokrasiya rastîn tenê ku gel bixwe, bê navbeynkariya desthilata siyasî an aborî, karûbarên xwe birêve bibe, pêk tê. Ji vir ve têgeha komînê bi awayekî nû hate pêşxistin. Komîn yeke yeke civakî û siyasî ye ku xwe bi xwe birêve dibe û niştecihên wê bi awayekî rasterast di biryarên ku bi jiyana rojane ya wan ve girêdayî ne, beşdar dibin. Ev têgeh tenê şêweyekî rêveberiyê nîne, lê dîtineke nû ye ku civakê dixe navenda biryardanê û desthilatê ji navendê vedigerîne cem gel.

### Komûna Parîsê: ezmûna ku dîrokê guhert

Nikare li ser jiyana komînal bê axaftin bêyî ku behsa Komîna Parîsê ya sala 1871'an were kirin. Ev ezmûn di dîroka rêveberiya gel de, yek ji bûyerên herî girîng tê hesibandin û gelek kes wê wekî yekem nimûneya rêveberiya gel bi awayekî demokratîk dibînin. Piştî têkçûna Fransayê di şerê li dijî Rûsya de, welat ket nav qeyraneke siyasî ya kûr. Bajarê Parîsê jî ji ber dorpêçkirinê, birçîbûnê û nakokiyên navxweyî bi şertên gelek dijwar dijiya. Di 18'ê Adara 1871'an de, Hêzên Parastina Neteweyî (Garde Nationale) û gelê Parîsê red kirin ku çekên xwe teslîmî hikumetê bikin. Wan kontrola bajarê girtin û ragihandin ku rêveberiyeke herêmî ya nû bi navê Komûna Parîsê hate damezrandin. Her çend ev ezmûn tenê 72 rojan dom kir, lê bandora wê li ser fikra siyasî ya cîhanê gelek mezin bû. Ji ber ku ew modela rêveberiyekê pêşkêş kir ku ji dewleta klasîk cuda bû. Komûnê berpirsiyarên xwe bi hilbijartinên rasterast hilbijartin, di heman demê de mafê gel hebû ku her dem bixwaze wan ji wezîfeyên wan rake. Herwiha gelek îmtiyazên ku çîna desthilatdar jê sûd werdigirtin, hatin rakirin. Mûçeyên karmendên payebilind hatin kêmkirin, ol ji dewletê hate cudakirin û reformên civakî hatin pêkanîn ku armanca wan baştirkirina şert û mercên jiyana karkeran û çînên belengaz bû.
Di heman demê de meclisên herêmî desthilatên fireh wergirtin, da ku karûbarên bajarê birêve bibin. Gel bi awayekî çalak di biryardan û jiyana giştî de beşdar bû. Ev yek bû sedema ku Komûna Parîsê bibe sembola demokrasiya rasterast û rêveberiya ku ji xwarê ber bi jor ve tê avakirin. Lê şertên ku Komûnê tê de derketibû gelek dijwar bûn. Ji aliyekî ve bajar di dorpêçeke leşkerî de bû, ji aliyê din ve kêmbûna amûr û çavkaniyan hebû. Herwiha cihê cudahiya ramanên siyasî di nav rêbertiya Komûnê de hebû ku ev yek hêza wê lawaz kir. Di dawiyê de hikumeta Fransayê bi alîkariya artêşa xwe êrişî Parîsê kir û di bûyera ku paşê bi navê "Hefteya Xwînî" hate naskirin de, Komûn bi zor hate hilweşandin. Di wê hefteyê de bi hezaran kes hatin kuştin, gelek ên din hatin darizandin an jî hatin sirgûnkirin. Her çend Komûna Parîsê bi awayekî xwînî bi dawî bû, lê di dîroka ramana siyasî de şopeke kûr hişt. Heta îro jî, ew yek ji girîngtirîn mînakên ku di nîqaşên li ser rêveberiya herêmî, demokrasiya gelêrî, rêveberiya xweser û beşdariya rasterast a gel de tê behskirin, tê hesibandin. Komûna Parîsê nîşan da ku civakek dikare her çend bo demeke kurt be jî, karûbarên xwe bi awayekî demokratîk û bê navbeynkariya desthilata navendî, birêve bibe. Ji ber vê yekê ev ezmûn tenê bûyerekî dîrokî nîne, lê heta îro jî, ji bo gelek tevger û ramana siyasî çavkaniyekî girîng a îlhamê ye.

### Ji Komûna Parîsê heta fikra hevdem

Piştî hilweşandina Komûna Parîsê, fikira têkildar bi rêveberiya civakî û komînalî re, ne rawestan ne. Berovajî, ew raman di nav pergalên fikrî yên cûrbecûr de berdewam kirin û di awayên nû de pêş ketin. Di nav sosyalîzm, anarşîzm û teoriyên demokrasiya herêmî de, fikra ku civak dikare xwe bi xwe birêve bibe, her tim hebû. Ev raman bi taybetî rexne li navendîbûna dewletê digirt û dibêje ku civak bi xwe xwedî potansiyel e ku biryarên xwe bigire. Di nîvê sedsala bîstan de, ramanzanê Amerîkî Murray Bookchin (1921–2006) ev raman bi awayekî nû pêşxist. Ew teoriya "Şaredariyên Azad" an "komînalîzma şaredariyî" pêşkêş kir. Bookchin dibêje; Ku demokrasiya rastîn ne di navendê dewletê de, lê di astê herî jêr de ango di tax, bajarok û bajar de dest pê dike. Li gorî wî, gel divê bi rêya meclisên herêmî karûbarên xwe birêve bibe û bi hev re hevkariya navherêmî pêk bîne, bêyî ku ev pergal bibe dewleteke nû ya navendî. Ev raman paşê bandor li hin tevgerên siyasî yên hevdem jî kir. Yek ji wan kesan ku ji Bookchin bandor wergirt, ramanzanê Kurd Rêber Abdullah Ocalan bû. Rêber Abdullah Ocalan ev teorî pêş xist û di çarçoveya berfirehtir de şirove kir. Ew di nivîsên xwe de têkiliyek di navbera: Demokrasiya rasterast, edaleta civakî, wekheviya jin û mêr, parastina jîngehê û pirrçandî ava dike. Ew model bi navê "Konfederalîzma Demokratîk" û "Neteweya Demokratîk" hate naskirin. Li gorî vê têgihiştinê; Civak ne tenê bi rêya dewletê tê rêvebirin, lê bi meclisên gelêrî, komîn û komînan tê avakirin ku bi hev re di nav tora hevkariya azad de dixebitin. Ev ramana nû, li gelek herêm û tevgeran de wek alternatîfek li hember modela dewleta navendî tê nîqaşkirin.


### Encam

Dîroka jiyana komînal nîşan dide ku civak her tim hewl daye awayekî ji bo birêvebirina xwe bibîne ku li ser hevkarî û beşdariyê were avakirin. Her çend dewlet wek modela serdest derket holê, lê ramanên komînal û demokrasiya rasterast heta îro jî wek alternatîfek zindî dimînin.

### Çavkanî

Karl Marx – Şerê Navxweyî li Fransayê
Murray Bookchin – Şaredariyên Azad
Abdullah Ocalan – Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk / Sosyolojiya Azadiyê

**Bîra Civakê**



**Rênas Efrîn**

## Azadiya sînorkirî azadiya ji destdayî ye

Sînorên azadiyê nabe ku bi yasa û pirensîbên sîstema li gorî kesekî lihevçêkirî werin danîn û weke zagonên neguhêzbar bên dîtin, azadî teqandina zincîrên yekrengiyê ye, çaxa ku yekrengî serwer be, tiştek bi navê azadiyan li holê namîne. Di dîroka mirovahiyê de ji şerê herî biçûk bigirin heta şerê herî mezin, tevahî şer ji bo azadiyê hatine kirin. Ev jî nîşan dide ku azadî ji bo mirovahiyê wateyek xwe ya pir girîng heye. Pirsgirêkên ku jiyan dike girêdayî azadiyê dibîne, di heman demê de çareseriya wan jî. Balkêş e di hinek zimanan de wateya azadî û rizgarkirinê yek e. Eger em li çend pênaseyên azadiyê mêzekin; wateya 'Lîberalîzmê' azadî ye. Felsefeya wê jî 'dilê te çi bixwaze bêje, dilê te çi bixwaze bike'. Li dijî civakbûnê ye, jiyaneke takekes û azadiyeke takekesî dide pêş. Her wiha Sosyalîzma pêkhatî jî xwe weke kopîyeke azadiyan nîşan dida, lê ya rast di cîhanê de gelek kopiyayên azadîyan derketine ku di bin navê azadî û mafên zarok de heqareta mezin, di bin navê azadiya jin de tecawzkirina mezin, di bin navê azadiya Olan de nezaniya mezin û herî dawî di bin navê modernîteyê de paşxistina mezin tê jiyankirin. Lewma jî azadî ji rastiya xwe bêhtir veguherî kopiyayeke çors ku her tiştî daduqirtîne û tune dike, ez nikarim înkara azadiyê bikim, azadî rastiyeke mutleq e, lê hewîrdora civakên cîhanî rê û şawazên azadiyan li gorî sîstem û îdeolojiyan sîstematîze kirine, niha li Kendava Ereban azadî ew e ku misliman dikarin bi 4 jinan re bizewicin, rêûresmên ola Îslamî ya ku dewletê dîzayn kiriye bingeh bigirin û di çarçoveya mafên jiyanî de hinek derfetên afirîneriyên sînordar hene, her wisa li Efganistanê dîsa azadî di çarçoveya yasayên hikûmeta Talîban de bi awayekî pir xirab taybet li ser jinê tê sepandin. Bi gelemperî di sîstemên cîhanî de azadî li gorî pîvanên wan sîstemên ku bi destê hinek serdestan hatiye çêkirin, hatiye parçekirin û kontrolkirin, lewma jî hêdî hêdî têgîn û prensîba azadiyan teng dibin û wateya xwe ji dest didin, bêguman di nava lepên hêzên hegemondar de wisa dibe, civak çiqas jî bên mehkûmkirin, dîsa hinek azadî di quncikên wê yên çandî de dimîne, bi demê re ger têkoşîn nebe, ew jî tê tepeserkirina. Azadî ne mijarek ku tenê mirovan elaqedar dike. Gerdûn zindî ye û gelek cureyên zindiyan hene. Di heman demê dê azadî ji bo giştî zindiyan derbasdar e.
Tê zanîn ku her kîjan civak di zeka, çand û aqlê civaka xwe de çiqas zane be û kûr be ewqas jî xwe azad kiriye. Her çiqas ev analîz rastiyekê diyar dike jî, berevajiyê wê jî rastiyek din nîşanî me dide. Ji ber ku zanebûn bêhtir nêzî azadiyê ye, nezanîn jî nêzî koletiyê. Rêber Apo dibêje "Azadî fêmkirin e" Kes çiqasî xwe û nasnama xwe ya civakî bizanibe ewqasî azad e, an jî dikare ji bo azadiyê têkoşîn bike. Jiyaneke komînal ava bike, xwe ji xefika takekesiyê xelas bike. Ji ber ku tekîliya zanebûn, têkoşîn û azadiyê bi hev re heye. Nexwe ev jî gotinek rast e ku civakek çiqasî xwe ji çand û aqil bêpar hiştibe ewqas jî koletiyê dijî. Di roja îro de Lîberalîzm hemû mafên civakî di bin navê azadiya kes de didize û dike milkê modernîteyê, ango li şûna ku gundek bi av, giya û bereketên xwe ji bo hemû niştecihên wî gundî bên qezenckirin û bikaranîn, hemû dikevin xezmeta kesekî, ew kes jî koleyê sîstema global e, di encamê de di kesayeta civakê de ferd, di kesayeta ferd de civak dibe amûreke koletiyê. Lewma jî azadiya ku ji cewherê civaka zana û kolektîv neyê qezenckirin, ew azadî vediguhere hêzeke tewş di destê komên beredayî û bê sîstem de. Li aliyê din çaxa ku lêgerîna heqîqetan raweste, hingê azadî tê mehkûmkirin, heta ku mirov di çarçoveya azadiya gerdûnê de lêgerîna heqîqetê neke, ew her tim para xwe ji koletiya mezin digire.